

Konferansa Aştiyê ya Laheyê riya aştiyê diyar kir:

Divê têkili bi PKK'ê re bê danîn



✓ Roja 14'ê gulanê li bajarê Laheyê, konfersansa kevneşopî ya aştiyê pêk hat. Di roja sêyemîn a konferansê de hate diyarkirin ku PKK aliye kî şer e û bo çareseriye, divê pêşî têkili bi PKK'ê re bê danîn. Li aliyê din TOSAV'ê li ser Kêşeya Kurd belgeyek weşand û di vê belgeyê de jî tê xwestin ku sîstema Tirkîyeyê jî nû ve bê sazkarin û pirdengî û pir-rengiye civakê bê nasandin. Di vê belgeyê de jî bi awayekî sergirtî PKK weki aliye kî şer hatiye binavkirin.

(Nûce:R.3)

Koma Medya li ser şanoya Mîrnişîna Baban axivî: Carina em nikarin tizbiyekê jî peyda bikin



✓ Koma Medya di bin sîbera Înstîtuuya Kurdî ya li Stockholmê de karûbarê şanoyê digerîne. Komê li ser dîroka Mîrnişîna Baban şanoyek amade kiriye û ev lîstik dê bo televîzyonê jî were pêşkêşkirin. Hevkarê me Serkan Brûsk, li ser şanoyê û xebatê komê bi wan re hevpeyvînek pêk anî.
(Di rûpel:8-9 de)

Lîstika bi kurdi qedexe ye

"KOMARA TIRKAN" JI "KOMARA DÎNAN" ACIZ BÛ

Taetra Jiyana Nû wekî her sal îsal jî xwest ku bi lîstika xwe ya bi navê 'Komara Dînan/Şermola' derkeve tûrneyê. Wê tûrneyê, di 15'ê pûşpera 1999'an de li Mêrsinê dest pê bikira û di 16'ê mehê de jî lîstik li Edeneyê bihata pêşkêşkirin. Lê lîstik ji aliyê Walîtiya Mêrsinê ve bi boneya ku 'teşwîqi cûdaxwaziye' dike, hate qedexekirin. Li Edeneyê jî destûr nehate dayîn.

(Nûce:R.11)

Gelê Îsraîlê riya danûstandinan vekir:

LI ÎSRAÎLÊ PARTIYA KARKERAN BI SER KET



Dî hilbijartina gîstî ya Îsraîlê de, ku roja 17'ê mehê pêk hat, kevnefermandar û peyrewê Îzak Rabîn, Ehûd Barak bi ser ket. Barak, serokatiya Partiya Karkeran dike û ev partî jî pêşengîya bloka bi navê "Yek Îsraîl" dike. Vê bloka ku ji sê partîyan pêk tê, ji hilbijartînê ji sedî 57'ê dengan wergirt.

(Rûpel:II)


KONGREYA NETEWEYÎ BER BI... Mirhem Yiğit

AŞTÎ Û TOLHILDAN
Sami Tan

DEWLETA QATIL
Nejdet Buldan

"HER ROJ QURM LI BER AVÊ...
Hasan Kaya

ZEDÎ KURDAN
Dr. Huseynî Xelîqî



E-Mail:s.berbang@usa.net

SAMİ TAN

İro aştixwazî parastina ewlehiya canê Öcalan e û xwestina azadiya wî ye. Dema em bi vê bîr û baweriyê tevbigerin, derfeta yekîti, aştî û azadiyê ji her demê zêdetir e.

Aştî û tolhildan

Di 31'ê gulanê de 'Doza Sedsalê' dest pê dike. Derdorêna faşist û şovenist dil dikin ku serhildan û berxwedana gelê kurd ji Öcalan bistin. Lewre jî çapemeniya tirk ji niha ve şik û gumana xwe li ser rengê dadgehê tînin zimên. Tê gotin ku dewleta tirk amadekariya lînçek nuxamî dike. Çeteyen Susurlukê, ku encama hilbijartîn wekî rûspandina (aklama) xwe dinirxîn û amadekariya şîrîkatiya hikûmeta nû dîkin, dixwazin bî vî awayî desthilatiya xwe xurtir bikin.

A di dilê wan de diyar e û li ber çavan e. Tişte girîng kesen demokrat û aştixwaz dê ci bikin? Heke wekî berê bêdeng û bêhelwest bîmîn, dê ferma xwe bi destê xwe rakin. Lewre çeteyen ku xwîna bi hezaran mirovîn demokrat û şoresser rijandiye, dê şerî li dijî gelan gurtir bikin. Ewê bi kuştina Öcalan nemînin, dê hemû kesen ku ji wan cuda difikirin, bikin hedfa sûrê wan ê devbixwîn. Çiroka Hitler ji hêla her kesî ve dê tê zanîn. Li hemberî vê

kirina çeteyan, dê gelê kurd jî bêdeng nemîne, ewê jî dest bide xwe û ewê jî bikeve pey hildana tola serokê xweyê neteweyî û tola zilma bi hezar salan. Heta ku careke din derfeta aştiyê bi dest bikeve, dibe ku bi dehan sal derbas bin.

Heke agirbesta 1993'yan bi ser biketa, dê bi hezaran mirovîn ku ji wê rojê heta iro hatine kuştin, ne di bin axê de bûna. Iro em li wê rojê digerin, gelek mijarîn ku me dikarî wê demê nîqaş bikin, iro em nikarin. Pişti ku çete di doza xwe ya 'tolhildan' de bi ser bikevin, dê rews ji iro geleki kambaxtir bibe.

Ji ber vê yekê divê tu kes li hemberî vê lînçê bêdeng nemîne. İro aştixwazî parastina ewlehiya canê Öcalan e û xwestina azadiya wî ye. Dema em bi vê bîr û baweriyê tevbigerin, derfeta yekîti, aştî û azadiyê ji her demê zêdetir e. Ev doz dikare riya aştiyê bo gelan veke. Li gorî agahiyen ku bi dest ketine, amadekariyên Öcalan ji ji bo vekirina riya aştî û azadiyê ye. Ewê di parasti-

na xwe de li ser vê yekê raweste.

Li pey agahiyen ku heta niha li ser komploya navneteweyî ya li dijî Öcalan û gelê kurd bi dest ketine, kesen ku ev komplot amade kiriye di nava xwe de nelihevîri ne. Bo nimûne tê gotin ku Yewnanistanê bi radestkirina Öcalan, xwestiye rî li ber şerekî di navbera kurdan û tirkân de veke. Öcalan jî di vê bîr û baweriyê de ye. Wî nameyeke ji şoresserî tirk Teslim Töre re şandîye û di nameye de vê yekê bi awayekî vekirî tîne zimên.

Her wekî li jor jî hate daxuyandin çeteyen tirk ketine pey tolhildanê. Lî tê gotin ku hînek aliyan jî xwestiye bi vê yekê riya çareseriye veke. Di vî warî de zêdetir navê DYD'ye derbas dibe. Li Tirkîyeyê jî kesen ku piştevaniya çareseriya Amerîkayê dîkin hene. Di vî warî de mînaka herî berbiçav Doğu Ergil û rîexistina wî TOSAV'ye. Lî divê bê zanîn ku kilîta çareseriya rastîn di destê hêzîn demokrat û şoresser de ye.

Di şoressê de rista ciwanan

Ferhengok

MUHAMMED MUHAMMED

Mirov beyî hestiyê pişte, li ser piyêne xwe nikare bisekine. Civak jî beyî ciwanan nikare jîyana xwe wekî katjmîrekê bi rû rîbazeke hemdemî bide meşandin. Lewre ciwan hêzeke zîrek û jêderka neketina enerjiyan bi xwe ye.

Ciwan ew e ku mîjî, raman, dilîn, fizik, lebat û jîyana wî/wê ji hemû aliye ve nû tê kemîlandin. Bi temamî tevlî jîyana kevin nebûye. Wekî rûpelekî ku hîn tam nehatîye dagirtin. Ji bo tijîkirina rûpel, edî pêwîst e wekî mamostekî û pisporekî mezin, ramana hemdemî ji wê pînûsî biherikîne ser rûpel. Yanî ew ciwan, çawa bikaribe mîjîyê xwe, bi bîrdoziyekî sosyalist, siyasetekî hemdem, çandeke nûjen, exlaq û terbiyeyeke şoresserî, mîna darekî, di kesayetiya xwe de bikaribe bide çandin.

Di vir de şoressa kurdan, ji bo ciwanan mîzgîna herî mezin e. Ji ber ku kesayetiya wan bi rîhê şoresserîye ve dimeyîne. Hemû gewşînên wan, bi bîrdoza zanîstî dide kemîlandin. Lewre ramanan Serok bi taybetî bo ciwanan, havêne. Havêne jî enerjî, hêz, dilîn, raman, şewaz û gewşînên wî/wê bi hev re dide kelijandin. Gava hêza mirov di xalekê de civiya û di bin serweriya mîjî

de tevbiger; fîr û hunerekî herî pêşketî diafirîne. Şoress ji bo ciwanan risteke wiha mezin dilîze. Wan bi ciwanîyê dide nasîn. Ciwantî bes ne tenê bi fizikî û temen e. Bêhtir ciwantî di mîjî, raman, dilîn û moral de ye. Tim jîr, çeleng, bi heyecan û bi zewqeke mezin ber bi jîyana azad ve dimeş. Di vir de, mirov dikare, di serî de kesayetiya Serok û gelek lehengen ku niha şehîd bûne ango dijîn wekî mînak bi de nîşan. Wan ciwantîya xwe xistiye bin barê neteweyî û sosyalizmî. Karê şoress, partîbûyîn, rîexistinî, şer û çalakiyê navneteweyî mîna ku tasek av vexwe wisa bi hêsanî, xebatê bi serkeftineke mezin dide meşandin. Ji ber ku enerjiya ciwantîye di xizmeta mirovahîye û jîyaneke serbixwe de dixebe.

Ji her ciwanekî kurd jî tê xwestin ku ciwantîya xwe têxe xizmeta şoressê. Yanê ew rûpelîn ku tam nehatîne dagirtin; bi dilînên neteweyî û ramanan şoresserî bide dagirtin. Gava ciwan xwe bi hemû aliye ve bi berjewendiyê welat ve girîdin; li ku dibe bila bibe, ewqas ne girîng e. Tişte girîng û pêwîst ew e ku ew ciwanan wekî cirûska êgîr, hewşa şoressê fireh bike. Bi baweriyekî xurt bimeşe, bi vîneke tûj li ber xwe bide, bi biryareke ji pola timî amade be, bi eşq peywira xwe pêk bîne û bi

çoşke mezin herdem kesayetiya xwe û hawîrdora xwe perwerde bike. Bi kurtayî, ciwan divê enerjiya xwe bo tişten bêkîr bikar neyîn. Timî wekî bombeya atomî amade be û gava pêdivî pê çêbû, divê pîma xwe li dijî neyaran bikişîne.

Yanî her ciwanekî kurd li kîjan qadê be, divê li wir rista ciwantîye bilîze. Çi ji aliye xwendinê, çi ji aliye çandê ve, çi ji aliye rîexistinî ve û ci jî ji aliye şer ve dibe; divê enerjî û şûrê xwe bi awayekî xurt ji bo azadiya gel û civakî bide xebitandin. Heta, divê ciwan spora xwe jî têxe xizmeta şoressê. Lewra dijîn û dewletîn împeryalîst bi riya sporê hemû ciwanan dixapîne û bi pergala xwe dike yet. Yanî ev hêzîn paşverû, tevayê quyet û enerjiya ciwanan didizin.

Divê ciwan bi zanebûneke kûr û fireh xwe bigihîn asteke ku bikarîn bersiva demê bidin. Ev jî bi armancêne mezin tê çekirin. Pewîst e ciwanen kurd li dewsa berjewendiyê şexsî û biçûk, berjewendiyê gelemerpi jî xwe re bikin bingeh. Çawa ku hevalê Mazlum ciwanîya xwe kir bin karê partîbûyîn. Egîd ciwantîya xwe hemû kir bin barê azadiyê. Ji tevayê ciwanan tê xwestin ku mîna wan lehengan hêz û enerjiya xwe di cihokîn şoressê de bidin herikandin.

belam: lê, lê belê
berfedîn: birêne berfê
yên belavbûyî
betlane: tatîl
çaya berçovî: keyif
çayı
çito: çawa, çilo
damezînî: avakar
daneger: bipeyketin
dawestîn: li ser
piyan sekinîn
dârawa: çewt, şas
dehatîn: peyabûn,
destavxane:
qedemgeh, daşir
destşo: lavabo
di: gund
divê: lazim (zorunlu)
dozandin: ditîn
êsta: niha, nika
ilar: sol, pêlav
gerdan: qewirandin
gewre: mezin
henderan: xerîbî,
diapora
hilpesîn: li hemberî
yekî sekinîn
hindê: cem, ba, nik

lêniştin: lêsiwarbûn
li berê dînyayê: li
darê dînyayê
nivan: mîvan
pêşgîr: hawlû
pêwîst: gerek
peywîr: wezîfe
sarîc: buzdolabı
serdem: hêyam
serşok: banyo
stewîn: perisîn,
kemîlin
şorxwes: zarxwes
tavîlê: yekser
telefona destâ: cep
telefonu
telefondan: tele-
fonkirin
xapxapik: şimik (ter-
lik)

xeber guhîtin:
xeber ragiandin
xeber hilanîn: xeber
standin
xeber spartîn: xeber
şandin
yarmetî: alîkarî
zor: pir, gelek

AZADIYA WELAT
ROJNAMEYA HEFTEYİ
(Haftalık Gazete)

■ Xwedî (İmtiyaz Sahibi)
M. NURİ KARAKOYUN
■ Yönetim Yeri:
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37
No:308
Beyoğlu/İstanbul

TEL: (0 212) 251 79 37 - 251 90 13
FAX: 251 95 85
■ Gerfindeyî Giştî yê Weşanê
(Genel Yayın Yönetmeni)
SAMI TAN
■ Berpîsê Karên Nîvîsaran
(Yazî İşleri Müdüriyeti)
M. SALIH TAŞKESEN
■ ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

■ Yayın Koordinasyon:
Ses Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.
■ BELAVKIRIN
BIRYAY Dağıtım
■ NIVîSGEHÎN TÊKİLİYÊ
(İrtibat büroları)
■ Amîd:
Tel: 0 (412) 223 34 83
■ İzmir
Tel: 0 (232) 446 19 50

■ Mîrîsîn
Tel: 0 (324) 233 83 96
■ Edene
Tel: 0 (322) 351 42 78
■ Nûnerî Giştî yê Ewrûpayê
Mahmut Gergerli
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815
■ Swîsre:
Ihsan Kurt

Tel-fax
41 21 652 76 07
■ Almanya:
Fener Rojibayan
Tel: 49 228 92 51 284
■ Sweden:
Şoress Resî
Tel: 46 86 52 34 29
■ Fransa:
M. Ali Doğan

Tel: 33 614 32 43 55
■ Belçika
I. Can
Tel: 32 53 64 12 41
■ Hollanda:
S. A. Fewzi
Tel-Fax: 31 10 48 555 43
■ Suriye:
Jana Seyda
Helifm Yûsiv

Konferansa Aştiyê ya Laheyê riya aştiyê diyar kir:

Divê têkili bi PKK'ê re bê danîn

Di konferansa navneteweyî ya herî kevn a cihanê de, hate ra-
gihandin ku bo çareseriya Kêseya Kurd divê têkili bi PKK'ê re bê
danîn. Konferansa ku li bajarê Hollan-
dayê Laheyê pêk hat, bi besdariya hiqûq-
nas, siyasetmedar û saziyên humanîter ro-
la 14'ê gulanê li dar ket.

Di civinê de parêzerê italî Fabio Marcelli bala raya giştî kişand ser rewşa kur-
dan û diyar kir ku gelê kurd, gelekî
bêdewlet e, lewre mafê otonomiyê ji bo
kurdan nayê pejirandin. Marcelli, da zanîn
ku di bingeha ser de nasnekirina he-
bûna gelê kurd heye. Di dawiya axaftina
uve de ji wî got ku, Öcalan di pêvajoya
Romayê de pêşniyazên geleki girîng kiri-
ne lê li wan pêşniyazan xwedî nehatiye
terketin. Wî, da zanîn mirov dikare li
berêmê konfederasyon an federasyonekê
awa bike ango dikare mafê otonomiyê bi-
de kurdan."

Di civinê de Prof. Dr. Ulrich Gottstein ji pêşin analizeke dûvedirêj li ser Komara Türk kir. Wî axaftina xwe wiha domand: "Gelê kurd têkoşîneke ku hemû beşen ci-
vakê dihewîne dide. Têkoşîna gerîlatiyê ji
parçeyek ji vê yekê ye. Tirkîye endamê
NATO'ye ye. NATO, DYA û welatên
din çekan difiroşin Tirkîyeyê. Di her wa-
ni de piştgiriya wê dikin. NATO ya ku
piştgiriya UÇK'ê dike û Yugoslavyayê
bombabar dike, li diji Tirkîyeyê xwe li
kerîy datfine. Parlementoya Ewrûpayê
(PE), NATO û NY di şerê li Kurdistanê
de tawanbar in. Divê di çarçoveya bir-
yarên ku PE'ye de hatine girtin, ji aliye
siyasi û abori ve zor li Tirkîyeyê bê kirin.

Çareserî divê li gorî ne- teweyekê be


Parêzer Mustafa Demir ji di axaftina
xwe ya ku li ser navê Yekîtiya Hiqûq-
nasen Kurdistanê kir de, diyar kir ku PKK
di warê leşkerî de bi rêtixtin bûye. Rêxi-
stineke ku xwedî konseya sazûmankar
(komuta konseyî) e û serokê wê ji Abdül-
lah Öcalan e. Parêzer Demir sedemîn ali-
büyîna ser a PKK'ê ji vegotin û bi bel-
gâyîn niviskî û dîtbârî mînak ji tevkü-
jîn Tirkîyeyê pêşkêş kirin.

Parêzeren Abdullah Öcalan Biritta Böhler, Eberhörd Schulz ji di civinê de li
ser doza Öcalan rawestîyan. Böhler wiha
axivî: "Ez nizanim bê wê di 31'ê gulanê
de çi bibe. Tişte ku dixwazin bikin têkili-
ya wê bi dadgehê re tuneye." Böhler bala
raya giştî kişand ser biryaren DMME'ê û
wiha got: "Revandina serokekî aliye ser û
xwestina darvekirinê helwesteke ne miro-

vane ye. Eberhard Schulz ji wiha axivî:
"Kurdan xwe bi Öcalan re kiriye yek.
Dewleta tirk dixwaze bi riya izolasyonê
kesayetiya Öcalan têk bibe."

Li ser navê ERNK'ê Mizgin Şen diyar
kir ku ew wekî nûnerê aliye ser besdari
civinî bûye. Şen da zanîn ku dewleta tirk
qebûl bike ji neke ji PKK aliye ser e.

Di civinê de delegasyona tirk ji amade
bû. Berdevkê delegasyona tirk Gündüz
Aktan wiha axivî: "Dema ku ez behsa



Di belgeye TOSAV'ê de peydabûna
şerî çekdarî wekî rûdaneke civakî
tê binavkirin û tê gotin ku hebûna
gelê kurd piştî şerî çekdarî darî çav-
bûye.

Kêseya Kurd dikim, tengav dibim. Em
lêkolinan dikin. Ez ji di nav de cih digi-
rim. Ji bo ku mafê çandî yê kurdan bidin
wan. Di vê panelê de bi tenê aliye kurdan
axivî. Divê hûn li me ji, li aliye tirkân ji
guhdariyê bikin. Bi salan e em vê yekê
dixwazin. Kes naxwaze xwîn birije. Çare-
seriya kêşeyê bi vî awayî zor e. Tecrû-
beyen dosten me yê kurd kêm in. Heta
dawiya konferansê dema me heye. Hev-
dîtin û nîqaş ji bo her du aliyan ji bikêr û
bifede ne."

Ji TOSAV'ê belgeye nêziktêdayîna hevpar

Digel rûdanen di qada navneteweyî de
di qada navxweyî de ji nirxandinê
balkêş têne kirin. Berî niha bi demekê, ji
aliye TOSAV'ê ve ku Prof. Doğu Ergil
serokatiya wê dike, xebateke bi rengê
"Pêşniyaza Qanûneke Bingehîn bo Çare-

seriya Kêseya Kurd û Demokratîkbûna
Tirkîyeyê" di bin navê "Belgeya
Nêziktêdayîna Hevpar" de ragîhand raya
giştî. Ji ber belgeye DGM'ê doz li TO-
SAV'ê vekir. Di belgeye de bi awayekî
hûrbînî li ser çareseriya Kêseya Kurd û
sedemîn wê tê rawestandin. Li pey agahi-
yan ew sé sal û nîvek e ku ew li ser vê xe-
batê disekekin. Li gorî belgeye dewleta
tirk wekî netewedewlet hatiye avakîrin.
Lê vê yekê berî avabûna komarî dest pê
kiriye. Lewre ji komara tirk li gorî awayê
xwestekîn dewletê, li ser bingeha nete-
wedewlet hatiye avakîrin.

Li gorî belgeye, di nava vê yekê de e-
nerjiyeke negatif derketiye holê û di nav-
bera civakî û dewleta de rewşen awarte
rû dane û vê yekê gelê ku xwe wekî lawê
di bin wesayetê de dîtiye, teşwîqî ser-
hildêriyê kiriye. Anglo daxwaza lawê ku
sebra wî li malê nayê û direve, hin mese-
le û kêşeyen nû pêk tîne.

Li aliye din di belgeye de tê gotin ku,
dewlet ji dîvla ku bi riya pirdengî û piren-
giyê yekîtiyekî pêk bîne, doza yekrengî û
yekdengiyê kiriye. Lewma vê yekê, rî li
ber nerazîbûna gel vekiriye û di navbera
du aliyan de şerî çekdarî dest pê kiriye.

Kurd piştî ku xwîn riji- ya hatîn dîtin

Li aliye din li gorî belgeye, ger şiddetî
rengê protesto û destnîşankirina xwes-
tekîn giştî li xwe bar kiribe û bi hezaran
çekdar vê riyê bi kar bînin, veşarî an eş-
kere bi sed hezaran mirov piştgiriya vê
rêbâzê bikin, diyar e ku ev diyarde (olgu)
tiştekî civakî û girseyî ye. Dîsa di belgeye
de tê diyarkîrin ku hebûna kurdan piştî ri-
jandina xwînî hatiye ditin. Belge ji raya
giştî vê pirsî dike: "Realîteya kurdan tê çi
wateyê?" Di vî warî de belge dide zanîn
ku tê wateya ji aliye hiqûqî ve pesendki-
rina(onaylama) hebûna kurdan.

Wekî din li gorî belgeye, divê kurd di-
gel zimanê fermî yê Tirkîyeyê karibin
nifşen nû bi zimanê xwe û li gorî da-
bûnîriten xwe perwerde bikin û divê
hewlîn wisa bêne piştgirîkirin. Di dawiya
belgeye de ji wiha tê gotin: "Çareseriya
demokratik a kêşeyen civakî ji hevfamki-
rina aliye kêşeyê û bi lihevkirinê gengaz
e. Ji bo ku ev yek pêk were, pêşin divê a-
liyîn ser kêşeyê bi awayekî azad di nav
xwe de nîqaş bikin." Di belgeye deigel
rakirina sistema cerdevaniyê, dawîlêhanî-
na kuşinên faîli meçhûl, rîveberiya xwe-
cihî ji hatiye xwestin.

NAVENDA NÜÇEYAN

Kurdistan NÜCE

ARTÊŞA TIRK ROKETÎN KÎMYEWÎ BIKAR ANI

Dî 11'ê gulanê de dewleta tirk li
Şîrnexê li dijî gerîlayê ARGK'ê roketîn kimyewî bikar
anî bû. Di encama vê bûyerê de 20
gerîlayan jiyana xwe ji dest da. Li
ser vê yekê fermandariya ARGK'ê
daxuyaniyeke çapemeniyê belav
kir. Di daxuyaniyeke de hate
diyarkîrin ku ev 15 sal in ku
dewleta tirk û artêşâ wê bi
rêbazên hovane bi ser wan de
diçe. Di daxuyaniyeke wiha hatiye
gotin: "Ligel ku dewleta tirk
Peymana Şer a Cenevreyê ye ìmze
kiriye ji, bi awayekî li derveyî
hiqûqa ser tevdigere." Li ser vê
yekê ARGK'ê bang li Neteweyen
Yekbûyî û saziyên navneteweyî kir.
Li dû vê rûdanê İHD'ê dest avête
bûyerê. Li aliye din Serokê
Yekîtiya Hiqûqnasen Kurdistanê

YAŞAR ERTAŞ BÜYER SERMEZAR KIR

Şkence dikeve bin çavdêriyê

Îngîlistan û Baroya Gallerê berî niha
bi demeke kurt dest bi xebata
amadekirina pêşniyaznameyeke der
barê 'şopandina pêvajoya di binçav
de' kir. Li Tirkîyeyê piştî ku maweya
di binçav de hate kurtkirin, da ku
bikaribin nêziktêdayîna dewleta tirk
û bergiriyê wê yên li hemberî gir-
tiyan tespit bikin û agahîyan bi dest
bixin, pêşniyaznameyek amade kir.
Di pêşniyaznameye de tê diyarkîrin
ku, piştgiriya fermî pêwîst e. Her
wiha di pêşnûmayê de tê xwestin ku
li cihen di bin berprisiyariya
Midûriyeta Giştî ya Ewledariyê û
Fermandariya Giştî ya Jendermeyan
de ye divê bên kolandin. Ji aliye din
ve tê xwestin ku walîyên bajaran bo
lêkolandina karakolan destûrê bide.
Ji bo lêkolinan dê lijneyeke dilxwaz
were pêk anîn.

'BOMBAYA ZINDÎ DI ÇAPE- MENIYA TIRK DE TEQIYA

Rojen 17 û 18'ê gulanê roj-
nameyên wekî Sabah, Hürriyet,
Milliyet û hwd. xebatkarê NC'M'ê
endamê Koma Azad Mehmet
Yapıştan wekî hedef nîşan da. Di
rojname û televîzyonan de li gorî
agahîya ku ji midûriyeta Enquerê gir-
tine, ew wekî bombaya zindî ya li
ber teqîn nîşan da. Li ser vê yekê
parêzerê Mehmet Yapıştan, Ahmet
Avşar, li İHD'ê bi daxuyaniyeke
çapemeniyê, hemû idîa derewandin.
Mehmet Yapıştan ji der barê bû-
yerê de diyar kir ku ew ji gelekî şas
maye. Sazbend Mehmet Yapıştan
dide zanîn ku, ew tenê dikare bi
tembûra xwe biçe 19'ê gulanê û
çanda xwe temsîl bike. Yapıştan dê
der barê rojname û televîzyonan de
doza tazmînatê veke.

Rehêni jiyana gel:

Çand - Huner - Wêje

Ji bo ku jiyana xwe bidomînin, hemû giyanewer ji xwezayê sûdê wêdigirin. Bo ku gel û netewe hebûna xwe bidomînin, divê ji alavên hilberînê sûdê wergirin û di warê aborî û teknolojiyê de pêşketî bin. Heke na, dê ew gel di nava çanda çend gelên serdest de bimehe û winda bibe. İro, cîhana serdest dixwaze li ser navê globalîzmê çandeke împeryalist bi gelên cîhanê bide pejirandin. Bi rastî navê vê yekê “împeryalîzma çandî” ye. Li dijî vê xetereyê, divê ci bê kîrîn an dê gel bikarîbin xwe bi ci awayî biparêzin?

Pêşî divê bê zanîn ku, çand, huner û wêje li ser xaka welatekî azad û serbixwe tê parastin. Welat, asêgeha çanda gel û hîmî huner û wêjeyeke neteweyî ye. Welat bi nirxên neteweyî tê naskirin. Netewe, ji pêkerê (unsur) çandî, hunerî, wêjeyî û hwd. pêk tê. Çand û huner û wêjeya gelê bindest qels û lawaz e, heta mirov dikare bibêje winda ye. Gelê ku welatê wî di bin lingê dagirkeran de biceiqe, mirov nikare behsa çand û huner û wêjeya wî bike. Edî bi parvekirina welatê wî re çand û hunera wî jî ji aliye dagirkeran ve hatiye lewitandin an jî tarûmar bûye. Gelê kurd jî yek ji wan gelan e ku bi hezaran sal in çand, huner û wêjeya wî, teví welatê wî ji aliye hêzên êrîşkar û mîtinger ve talan bûye û hê jî dibe. İcar ev gelê hanê dê çiqasî hay ji çand û wêjeya xwe ya resen hebe ku bikaribe lê xwendî derkeve? Gelê ku li ser xaka xwe wekî penaber û biyaniyan bê dîtin û çanda wî bi zagonê zengarî hatîbe qedexekirin, dê çawa bikaribe xwe bi cîhana hemdem bide naskirin?

Diziyê çandî û hunerî!

Dergûşa şaristaniyê û navend û çavkaniya çanda gelan Mezopotamya ye. Gelê kurd jî yek wan gelê Rojhilata Navîn ê herî qedîm û xwedîyê çandeke kevnare ye. Gava ku Mezopotamya an Mezrabotan tê gotin, çand û bi taybetî jî çanda gelê kurd di hişê mirov de derbas dibe. Ew xaka adan, ku di navbera çemîn Dîjle û Ferat de cih digire, bi xwîn û xwêdana bav û bapîrêne kurdan hatiye stirandin û bi çand û hunera wan hatiye neqîşandin. Jix-we sedema dagirkirin û parvekirina Kurdistanê, adanî û dewlemendiya wê ye. Heke Kurdistan, ne navenda çand û şaristaniyê bûya, ewqas sal nedibû navenda ser û hedefa êrîşen hovane. Heke gelê kurd ne gelekî qedîm bûya, dê ji mîj ve ji holê hatîba rakirin û iro navê kurd û Kurdistanê jî li holê nedima. Belê ji ber ku hêzên Kurdistanê dagirkirine her dem pişti kurdan hatîne li ser xaka wan bi cih bûne. Navê çol û çiyan, gund û bajaran giş bi kurdî hatîne danîn. Çanda ku bi destê kurdan hatiye asîrandin zû bi zû winda nebûye, hatiye guhartîn û mehan-



din. Çewisandinê li ser gelê kurd û çanda wî têra bisaftinê nekiriye. Ji ber ku gelê niştechî yê heremê gelê kurd e. Hêzên dagirker nikaribû çanda kurdan ji holê rakin, berevajîyê vê ew di bin bandora çanda kurdan de mane. Tew iro hemû hêzên dagirker çanda kurdan wekî çanda xwe nîşan didin û dibêjin “Em xwedîyê çandeke dewlemend in.”


Heta iro tu nirxên me nemane ku ji aliye hêzên dagirker ve nehatîbin lewitan din. Çand û huner û wêjeya kurd wekî ya tîrk bi nav dibe; stran, çîrok û metelokên me bi zimanê tîrkî tene gotin. Govend, dîlan û folklorâ kurdî wekî ya tîrk tê nîşandayin û hemû nirxên me yêneteweyî wekî wêjeya tîrk tê hesibandin. Bi rastî navê vê yekê dîzî, talan û korsanî ye. Her çandek, xislet û taybetmendiyê wê yê xweser û resen hene. Wekî mînak, her stranek zimanê wê yê resen heye. Gava ev stran ne bi wî zimanî, bi zimanekî din bê gotin ji resentîya xwe dûr dikeve û mirov pê natamije. Çawa ku her mirov helbesta xwe bi zimanê xwe dirêse û gotinên wê nayêne guhartîn, stran jî wisa li zimanê biyan tenê tene wergerandin. Lî mixabin kesen ku hay û bayê wan ji çand û hunera kurdî nîn be, dibêjin qey ew stranen ku ji nava dilê Kurdistanê derbûne bi dengê Izzet Altînmeşe, Mahsun Kîrmîzîgûl, İbrahim Tatlıses û hwd. tene lewitanin, wekî stran û helbesten tîrkî ne û dibêjin ev dengbêjîn Rojhilat û Başûrê Rojhilat (Doğu ve Güneydoğu) rûspîtiya muzîka gel a tîrk (Türk Halk Müziği) in. Nabêjin ku ev rûreşî û bextreşîya gelê kurd û tîrk hemû di kesayetiye wan kesan de civiyye û çanda her du gelan ji tene lewitanin. Mirovê ku bixwaze huner û hunermendê kurd binase bila ne li Izzet Altînmeşe û hwd. tunebe, dikare der barê wêjeya kurdî de biaxive? Mirovê hayê

je; bila li kaseta Mihemed Arif û Hesen Cizrawî “Ez kevok im lê lê...” guhdar bîke, da ku bizanibe çand û hunera wî ya resen çawa hêja û bedew e. Bila dîsa zanibe ku bi hezaran stran, helbest, gotin, biwêj, metelok, çîrok, pêkenok, lîstik, go-vend û folklorâ kurdî wekî çanda tîrkî bi gelên heremê û heta û heta bi teva cîhanê dane pejirandin. Belê divê her mirovê kurd hay ji vê yekê hebe ku çand û huner û wêjeya wî tenê dikare bi destê wî bê parastin. Mirovê ku li çand, huner û wêjeya xwe xwedî dernekeve, dê ew çandeke melez an jî çandeke piştafî bipejirîne û di xizmeta wê de bixebitê.

İro gelek hunermend û dengbêjîn kurd di xizmeta gelê xwe de ne û bi fedekarî peywira xwe bi cih tîmin. Divê gelê kurd, edî terka wan kesen ku ziman û zaravayen kurdî bi tîrkiyeke nîvco dilewîtinin bike û nema li wan wawîkan guhdariyê bike. Em ne li dijî tu ziman û zaravayanin lî ew tiştîn tene gotin ne bi tîrkî û ne jî bi kurdî ne. Zimanekî çewtomewto û lewîti ye. Tu fêdeya ku li gelan bibe, tê de nîn e.

Wekî jiyana me çanda me jî di xetereyê de ye

Li aliye din iro bi dehan weşanen me derdi Kevin, ci li hundir ci li derveyî welêt, rojname û kovarêne me tene weşandin. Di van weşanen de navê gelek helbestvan, dîrokzan, civaknas, hunermend, wêjevan û rewşenbîren kurd ên hêja derbas dibe. Berhemên wan li çarmedorê cîhanê belav bûne lî mixabin, haya gelek mirovên kurd ji wan nîn e û dibe ku navê wan ji nebilistibin. Mirovê ku haya wîjî ji Ehmedî Xanî, Feqîyê Teyran, Melayê Cizîrî, Baba Tahirê Uryan, Osman Sebrî, Cegerxwîn û hwd. tunebe, dikare der barê wêjeya kurdî de biaxive? Mirovê hayê



Dengbêjî Şakiro
Gelek stranbêjîn wekî Mahsun Kîrmîzîgûl kurdnjad, digel ku dê û bavê wan bi tîrkî nizanîn û bi awayekî kurdevarî mezîn bin jî wekî “noka ku çûye bajêr” dixwazin bibin leblebî lê “giya li ser kokê xwe şîn tê.” Tiştî balkêşîr, tê gotin ku Özcan Deniz jî neviyê dengbêjî nemir Şakiro ye.

wîjî ji çand û hunera wîjî tunebe dikare li nîrxên xwe yên neteweyî xwedî derkeve û xwe bextewar bihesibîne? Mirovê ku ji çand, huner û wêjeya xwe sûd wernegirtibe dikare hesten xwe, fîr û ramanen xwe bîne ser zimîn? Heke bikaribe jî dê çiqasî, bi ci awayî, ji bo kê û ji kê re bîne zimîn? Mirov çiqas zana dibe bila bibe, gava ku bi zimanê xwe neaxive, di xizmeta kesen li dijî xwe de ye û karê wan hênsantir dike. Mirov çiqas pîspor dibe bila bibe, gava ku ne di xizmeta çand û hunera gelê xwe de be, nikare rola xwe pêk bîne û di nava gelê xwe de bi serbilindî bijî.

Çand, hîmeke netewebûnê ye. Ziman, wêjî û huner şaxen çandê ne û çand bi van hêmanan têkûz dibe. Her yek ji wan wekî rehê jiyana çandê bi kar tê. Li kîjan deverê çand hebe li wir teqeze huner û wêjî ji heye. Çand her dem bi hunerê dest pê dike û bi wêjeyê didome. Pêşveçûna çandê bi hunerê, ya hunerê bi wêjî ve girêdayî ye. Wêjî wekî din jî dibe peywira parastin û bipêşxistina ziman û zaravayan.

Bi kinayî, çand û huner û wêjeya me bi qasî dîroka me kevnar e, lê bi qasî jiyana me jî di xeterê de ye. Heke em li hemberî bayê globalîzmê xwe neparêzin, dibe ku zarok û neviyêne me berfî ku bîbin kurd, pêşî bîbin tîrk û paşê jî bîbîne îngîlîz. Riya piştafîna gelan, iro di împeryalîzma çandî re; riya parastina jî di welatekî azad û serbixwe re derbas dibe.

Di kurmancî de perçînkirin

CIHAN ROJ

i zimanê kurdî de bi van awayan gotin tê perçînkirin (pekiştirmeye) û tê kirpandin:

1) Bi alikariya hin peyvan. Pêwîst e mirov der barê van peyvan de cend tişan bibêje:

a) Piraniya wan bêwate ne an jî berê watedar bûne, niha wateya wan nayê za-nîn.

b) Wan rista rengdêran hilgirtiye.

c) Dema ew tê pêş an jî paşıya navdêre peyveke xwerû pêk tê. Pirî caran wek biwêj jî tê bikaranîn.

Tarî zimak: reş tarî (zifiri karanlık)

Mînak:

*Derve tarî zimak e, çav çavan nabîne

*Dinya tarî zimak e, tevnegere! (Li

vir wekî biwêj hatiye bikaranîn.)

Xap xalî: vit û vala (bomboş, issiz)

Mînak:

*Riya wî bi ciyayê Sîpanê ket, her der xap xalî bû. Êdî bi xezalan re heval bû.

Tût û rût: şîlf û tazî (çırılçıplak)

Mînak: ji karê nebaş tût û rût ma.

Tûk û tenê : tik û tenê (yapayanzı)

Mînak: Li darê dinyayê tûk û tenê ye.

Sîk û sar: ava pir sar (buz gibi soğuk)

Mînak: bi ava sîk û sar pot şüştin.

Ham û tam: bi tirkî tas tamam

Mînak: bovlat di stûyê xwe de anî halbûkî ham û tam bû

Hesl û fesil: ta baş tênegihêje hesl û fesla wê neke qey tê!

2) Heman peyv tê dubarekirin û tê parçekirin

*Spî spî mîna berfê

küçük hewt! hewt! hewtehewt

çivîk çewk! çewk! çewkeçewk

elok lûk! lûk! lûkelûk

dîk û ürû û üûû! üreûr

Bangkirin

Ji alî deng ve di navbera mirovan û hinek ajalan de têkîlî heye. Ew dengen ku ajal hîn bûne xwe li wan digirin. Bo mîrîk û dîkan: cû! cû! cû!

bo mihan: de! de! de!

bo gayan: tixe tixe tixe!

bo pisîkê: pisî pisî pisî

Dengine ku ji bo ajal cih biguherin

bo mihan: herî! herî!

*Reş reş mîna qîrê

*Zer zer mîna şimayê

*Sor sor mîna xwînê

*Tal tal mîna axû

Li vir s, r, z, t ên duyemîn bi kirpan-din gelek stûr tê xwendin.

3) Du peyv bêñ nik hev û du pirî caran ji peyvan yek bêwate ye û ji bo perçînkirinê ye. Ev peyvên hevedudanî her çiqas xweser xuya bikin jî tê de perçînkirin heye.

“Seltopelto”

Selte: ji bo tişten pan, dirêj û sist, tê gotin.

Seltopelto ji bo kesê/a ku li cil û kincêñ xwe xwedî dernakeve, nepaqij e tê gotin.

Cend mînakên din: aşobaço, teredîn, pelûpot, qilopilo, serûber, şoder...

bo ga: ho! ho!

bo hespan: dah! dah!

bo kûcîk: hoş! hoş!

bo bizinê: yeh! yeh!

bo pisîkê: pis! pis!

bo çelekê: çêlê! çêlê!

Dema dîk pev diçin wiha pesn tê dayîn: trîs, tiştişîs dîk!

Gava beran pev diçin, wiha pesn tê da-

yin: Ere e! ere e! e!

Ji bo ku ga bifetile “îş gayêîş” tê go-

tin. Ji bo ku ga raweste “ohoo o! Êê êh!” i bo ker jî raweste “çooşş! Şooşş!” tê go-

tin.

Peyvîn ku ji olanê pêk tê

Hin peyv ji olanen suriştî pêk tê. Razber in. Carinan bi bê (bayî) re carinan bi barîna baranê re, ji ajalan, bi bandora insan û ajalan dertê.

*Vizînî ji dengê vizz! vizz!

Mînak: bihar hat, vizeviza mîşan e.

Qîrçeşîrji dengê qîrç! qîrç!

Mînak: Qîrçeşîrça darane, welê dişewite...

Xiştexist ji dengê xiş! xiş!

Mînak: ku tirpan davêt gîhê, xişte xişa wê kîfa mirov dianî.

Gulpînî ji dengê gulp!

Mînak: Gulpînî ji êgir tê hindik maye bibe koz.

Bilqînî ji dengê bilq! bilq!

Mînak: bilqe bilqa avê ye.

Zîmînî ji dengê zîmm! zîmm!

Mînak: zarok ji ser darê ket, zîmînek jê hat min got qey mir.

Xuşexuş ji dengê xuşş! xuşş!

Mînak: xuşîna avê, pel û pûşan bû.

Şîrinî ji dengê şîrr!

Mînak: şîrina ji gurgureyê dihat, carinan diqlibî orîn û nalşînê.

Tingînî ji dengê ting! ting! tê.

Mînak: tinginiya saz bû.

Vingînî ji dengê ving! vînng!

Mînak: vingevinga vê mîşê guhêñ min ker kirin.

Vîzînî ji dengê vîzzz! vîzzz!

Mînak: dîsa vîzevîza texsî, qem-yon û otobûsan bû.

Pisînî-kusînî ji dengen pisss! kusss!

Mînak: tatikê erekê teqîya, pisîn û kusîn e.

Dewleta qatil

NEJDET BULDAN



E-mail: oramarbuldan@online.de

Gelek welat an jî dewlet bi navê cuda cuda tên naskirin. Mînak di qada navneteweyî de navê îngilizan Brîtanaya Mezin e. Berê jê re “împaratoriya ku roj li ser naçe ava” dihat gotin. Niha kes nabêje Iraq. Dibêjin “rejîma xwînxwar”, “re-jîma Seddam”. Navê împaratorên Japonan, “Kurê Rojê” bû û hwd. Ew nav û nişan paşê li gorî demê her tim dihatin guhartin.

Dema zarokatiya me, dayikêne em bi leşkerên Romiyan ditirsandin. Ez bawer dikim ku niha jî ew taybetiya Romiyan nehatiye guhartin. Rêveberên Osmaniyan jî bi navê nexweş û bitirs ketine dîrokê. Mîna Murat Paşa yê bîrekar. (Kuyucu Murat Paşa) Bi hezaran mirov bi saxî dikirin çal û bîran de û dikuştin.

Navê tirkan û dewleta Osmaniyan li cem ewrûpiyan barbar bû. Yewnan û ûtâli niha jî qala barbariya tirkan dikin. Komukuya tirkan jî bîra wan neçûye. Li Îtalyayê, li devê Deraya Spî niha jî gundek heye. Navê wî Badalato ye. Dema salêñ borî gelek koşberên kurd

dihatine ïtalyayê, em cûn cem wan. Nêzî sed kesan li Badalato hatibûn bicikhîrin. Serokê belediyeye wê derê li ser şîvê wisa digot: “Dîrok, mamosteyeke ecêb e. Sêsed salan berî niha ew gund ji tîrsa Osmaniyan li vî ciyayî hate avakirin. Niha jî kurdên ku ji ber zîlma tîrkan direvin, bûne gundiyan Badalato.”

General Mistefa Muğlali li Wanê, Ebekê (Ozalp) 33 kes carekê dan kuştin. Dîroka tîrkan û kurdan şahidê bi hezaran bûyerên bi wisa ye. Di 1991’ê de li Gewerê heft kesen Goyî bi destê Binbaşî Ali Kiraz û heval-bendên wî serok cehşan katin qetikirin. Navê wan yek û yek em dizanin. Şervan nebûn, ticar û etar bûn. Malbatên wan ji Goyan hatin ku cenazeyen mirovên xwe bibin. Dewleta tîrkan nehişt û got: “Şevê dî li nêzîkê gundê Kuçê di navbera hêzên me û terorîstan de şer derket. Me heft “terorîst” kuştin.”

Di dagirkirina Kibrîse de (1974) 1600 rûm berze bûn. Bîst û pênc sal in dewleta Kibrîse û malbatên wan li windahiyen xwe digerin. Dewleta tîrkan bi fermî got ku ew windahiyen şer in û wan ji bîr bikin.”

Di sala 1992’yan de balafirên tîrkan agir barandine ser gundiyan Navşarî. Paşê tê bîra min serokwezîre wan ev gote me: “Biborin, qayışen ku bombeşîn balafirên me digerin sist bûn. Ji ber wê çendê bombe ketine ser gundan.” Salêñ 91, 92 û 93’yan, salê çend caran li bajaren me bombe dibarandin. Sûk û bazarêñ bajaran talan dikirin. Sûkên nêzî

dahêren polisan jî dihatine talankirin. Ü wan digot: “Şevê dî ‘terorîstan’ êrîş anîye ser bajârî. Dema em diçûne cem rayedarên dewletê me digot: “Belê, mezanî ku terorîstan êrîş anî ser bajêr, lê bi bihayê milyaran tiş ji sûkan hatiye talankirin, gelo terorîstan ew tiş cawa barkirin, birin?” Bersiva wan ev bû: “Dewleta Tîrke dewleteke mezin e. Li dijî êrîşan me hûn parastine. Hûn me bi talankerîye tawanbar dikin, dewlet diziyan nake.”

Niha em dizanin ku heft kurdistanîyen Rojhelaftî li gundê Katûna Nawşarî bi destê dewleta tîrkan hatin kuştin. Malbatên wan aşke-ra kir ku ev mirov ne şervan bûn, ji bo idara xwe ya rojane wan bazirgan dikir. Dewleta tîrkan nehişt û got: “Şevê dî li nêzîkê gundê Kuçê di navbera hêzên me û terorîstan de şer derket. Me heft “terorîst” kuştin.” Mîna bîst û heft kurdên ku ji Başûr, ji Şeqlawa û Silêmaniyê hatin û li Alyawa hatine kuştin (1995). Pêwîst e ku saziyên mafê mirovan diparêzin, van bûyeran ji bîr nekin. Pêwîst e ku malbatên kuştian van bûyeran ji bîr nekin. Hemû sazî û dezgehêñ navneteweyî mafê xwe bipirsin. Dibe ku encamên em dixwazin ji van serlêdan dernekevin. Lî dîsa ji rûyê dewleta qatil û diz eşkera dibe. Ji ber ku dewleteke diz û derewîn e. Ev rewşa wî li hemû cîhanê hatiye pejirandin. Serê hemû malbatên kuştian xweş, rûyê dewleta qatil reş be.

Yekemîn şehîda zîndanê ya jîn:

Serpil Yılmaz

Jiyana Hevala Serpil, hemû têkoşîna wê, ji bo welatekî û kesayetiyeke azad a jinan bû. Dil, giyan û ram-yariya wê, bi doza welat û jina azad hat-ibû lêkirin.

Serpil Yılmaz (Dozdar) di sala 1972'yan de li navçeya Ardahanê bi ser Qersê ve ji dayik dibe. Bâvê wê mamoste û rewşa wan a aborî normal bû. Ji bo ku li nav malbata wê, şoresgerî û welatparêzî hebû. Hevala Serpil nêziki şoresgeriyê bû. Zarokatiya wê li Serhedê dibihure. Beriya 12 Rezberê giregirên Partiyê, ku li Serhedê xebatê dikin, diçin mala Hevala Serpil û bi wan re têkiliyê datinîn. Di nava van giregiran de Akif Yılmaz jî heye. Hevala Serpil, cara pêşîn egiti, fedekarı û peyana (pesn) Kurdistanê ji wî bihistibû. Ew hevalen ku bi roj nedixuyan lê bi şev çekdar bûn, ji bo wê payeyeke ku qet negihêje bû. Dema Cuntaya 12 Rezberê pêk hat, Hevala Serpil 8 salı bû. Wê, hîna wê demê bîra zordarî û çewsandinê biribû.

Hevala Serpil heya liseyê li Serhedê dixwîne, piştîre di sala 1990'ı de beşa mamostetyî ya Zanîngeha Marmarayê qezencî dike. Vê serdemê, ciwanen welatparêz bi berfirehî bi rîexistin dibin. Hevala Serpil, zû bi zû ligel ciwanen welatparêz têkiliyê girêdide û bi giyanî û dilsozi bersiva hemû peywirêne wê demê dide.

Hevala Serpil digel şermezarkirina



Serpil Yılmaz

zext û komkuiyê, li welatê me teví hemû çalakiyêni ciwanan dibe û di rîzen pêşîn de cih digire. Dema çalakî an jî karek bîhata kîrin, bi derdora xwe dişêwirî. Her wiha dema pêkanîna hatibuya, qet ji ser a xwe nedihat xwarê. Hem plansazî dîkir û hem jî pêk dianî.

Piştî demekê qada wê ya têkoşînen teng dibe, lewre têkiliya xwe û malbatê qut dîke û di nava xebata eniyê de cih digire. Peyre demekê li Stenbolê dimîne, paşê derbasî Sakaryayê dibe. Li vê derê



Serpil Yılmaz (Dozdar), di dema zarokatiya xwe de têkoşînê nas dike. Şoresger mîna Akif Yılmaz gelek caran dibin mîvanê wan. Yılmaz, sala 1993'yan dema li zanîngehê ye, teví refîn gerîla dibe û demeke dirêj li qada Dêrsimê şer dike. Peyre ji ber nexweşîya xwe tê Sakaryayê lê tê girtin. Ew, piştî işkenceyên xedar, ji ber ku nayê tedawîkirin, di sala 1998'an de jiyana xwe ji dest dide.

di demeke kin de bi girseyê re têkiliyeke xurt saz dike. Hevala Serpil xebata xwe bi şêweyekî hûrbînî û zanebûn digerand. Dîsa jiyana wê, bi serûber û bi pergal bû.

Ew, di nava gel de bi nefsbîcûkî û zanayane tevdigeriya. Rêzgiriya wê bo

gerîlatiyê dest pê dike. Peyre dibe fermadarê pelê (manga).

Ji fêza ne di cih de, hestêن paşverû, wekî kesayefî û armancâ sivik nîfrîn dîkir. Lewre armanc mezin bû. Rizgarî û azadiya jînê, bi ked û têkoşîna wê mimkûn e. Her çend dijwarî û zehmetî

dîtibûn. Yek bi yek bûye şahîdîn êrîşen kobrayan. Hevala Serpil hemû xweşikahî û dijwariyên jiyana gerîla jiyabûn. Wekî rojên sar û seqemê, wekî rojên bîharê...

Piştî vê têkoşîna bêwestan û rawestan, Hevala Serpil nexweş dikeve û bo tedawîyê tê Stenbolê. Ji bêgaviyê diçe ser doktorê dijmin û di vê navberê de tê binçavkirin. Dema binçavkirinê ew ji serê xwe darbeyen kujinde (oldürücü) dixwe. Lewre tenduristiya wê nebaş dibe û bi vî awayî wê diguhêzînin Girtigeha Sakaryayê. Di binçav de li hemberî işkenceyên xedar jî dijmin bi wê nikare. Lewma dijmin Hevala Serpil li girtigehê bêderman û bêtetedawî hişt, da ku bi vî şêweyî bikuje. Lî Hevala Serpil heta roja şehadetê jî dilges û kîfxweş bû. Ligel vê, wê moralâ hevalen xwe jî ges û gur dîkir. Wê, di zîndanê de jî her tim zanîn û karîna xwe bi pêş dixist.

Hevala Dozdar, di sala 1998'an 5'ê rîbendanê de gîhişt refîn pakrewanan. Ew, yekemîn şehîda jîn a zîndanê bû.

Belê ew mîlitanekê têkûz bû. Taybetmendîyeke Hevala Serpil a berbiçav jî têgîhiştina Serokatiyê bû. Wê digot: "Serokati xezîneya min e. Ez bi wî dimeşim. Gava ku li min diqewime, ez li wî digerim û kêmasyîn xwe sererast dîkim." Wekî din, ew, bengî û dilsozê axa Kurdistanê bû. Berî ku şehîd bikeve, ji malbateke welatparêz mistek ax xwestibû. Ew ax negîhişt ber destê wê lê gîhişt axa Kurdistanê, evîna xwe.

HEVALÊN WÊ YÊN TÊKOŞÎNÊ

Hevala Serpil, li çar aliyê Dêrsimê gav bi gav digere. Bi çavên serê xwe, têkoşîna gerîla ya li dijî hovîfî û dirindetiyekê bêpayan dîtibû.

Ma Hevala Serpil kî nas nekiribû!

Ji keça serkêş a Dêrsimê Hevala Besê, Hevala Zîlan ta Hevalê Celal Barak, Hevala Bermal û lehengên mîna wan.

mezinan, bo zarakan jî hebû. Lewre li her dera diçûyê, mirovan jê re rîz digit. Wê bas pê dizanî, dê çi û çawa ji girseyê bixwaze. Di vî warf de raste-qîniya gelê me berçav nedikir. Di mijara moralê de jî, bûyer û kiryarên heri biçûk jî dinirxandin. Her qada ku diçûyê moralâ ges û berz dîkir. Mirov bi hestan bêhtir, bi zanebûn bi têkoşînê ve dihate girêdan. Bi her kesî re dida û distand. Li gorî zanîn û karîna wan peywir û xebat dispartin her kesî û riya wan ronî dîkir.

Di dawiya 1993'yan ligel sê hevalen xwe derbasî Eyaleta Dêrsimê bû. Gîhiştibû çeka ku ji zarokatiya xwe ve hesreta wê dîkişand û qada ku bikaribe lê şer bike. Bi şêweyekî azadane çekê hembêz dîke. Bi vî awayî jiyana wê ya

Li NCM'ya ïzmîrê
● 22.05.1999 şemî
Konsera Koma Çiya, saet:17:00
● 23.05.1999 yekşem
Konsera Koma Çiya
seansa yekem, saet:15:00
Seansa duyem, saet:18:00



Li BEKSÂV'ê
● 22.05.1990 şemî
Konsera Koma Rojhilat, saet:18:00
Li YÇKM'ê
● 23.05.1999 yekşem
Biranîna Ibrahim Kaypakkaya
Bername: Mehmet Durna, Koma Agirê Jiyan, Koma Munzur,
Sehneya Gel a Babilê, nîşandayîna DîA'yan û malbat, saet: 15:00

Di destpêka sedsala 21'ê de lîstika bi kurdî qedexe ye

“Komara Tîrkan” ji “Komara Dînan” aciz bû!

Li Tîrkiyeyê, li aliye kî li ser navê hunerê festival têne lidarxistin, li aliye din di festivalan de film têne qedexekirin û ji bernameya festivalê têne derxistin. Li aliye kî mihrîcanê şanoyê têne lidarxistin, li aliye din pêşkêşkirina hinek şanoyan tê berbendkirin.

Sala par, piştî morkirina salona şanîdanê ya NCM'ê, li hemberî xebatê wan ên din jî asteniyen dewletê zêde bûn. Ji sala par heta iro gelekar caran bi ser NCM'ê de hatiye girtin û xebatkarên wê hatine binçavkirin. Komên muzik û dîlanê ku ji bo bernameyê diçün derveyê welêt, hatine binçavkirin û dûre ew ji bo girtîgehê hatine şandin. A niha jî pêşî di mihrîcanê de li hemberî kurtefilmê bi navê “Ax” û dûre jî di turneyê de li hemberî Taetra Jiyana Nû, biryara qedexeyê hate bikaranîn.

Filmê Ax ji bernameya mihrîcanê derxistin

11'mîn Mîhrîcana (festival) a Navneteweyî ya Filman a Enqereyê ku di navbera 26'ê avrîlê û 9'ê gulanê de pêk hat, kurtefilmê NCM'ê yê bi navê Ax, ji bernameya mihrîcanê hate vederkirin. Ji bo besdarbûna mihrîcanê, Beşa Sînemayê ya NCM'ê serî li rîveberiya Mîhrîcanê da. Rîveberiya mihrîcanê, filmê Ax ji aliye teknik û estetik ve baş dît, lê li gorî gotina wan, ji ber ku naveroka film “xetermak (sakîncalî)” hate dîtin, bi dudîlî nêzîkî film bû. Dûre film ji bo pêşbazîya mihrîcanê hate pejirandin, lê içar ji bo nîşandayîna film destûrname (tişte) ku ji tu filmî nehabîtû xwestin, destûra Wezîre Çandê yê Komara

Tîrkiyeyê ji wan hate xwestin. Bi destpêkirina mihrîcanê re ji bo beşa sînemayê NCM'ê hate ragihandin ku film ji bernameya mihrîcanê hatiye derxistin. Rîveberen Beşa Sînemayê ya NCM'ê her çiqas dîsa serî li Lijneya Hilbijêr a Eslî da jî tu encam bi dest nexist û filmê Ax tevî mihrîcanê nebû.

Şanoya bi Zimanê Kurdi Qedexe ye



Taetra Jiyana Nû wekî her sal îsal jî xwest bi listika xwe ya Komara Dînan/Şermola derkeve turneyê. Turneya wan wê di 15'ê pûşpera 1999'an de li Mêrsînê dest pê bikira û di 16'ê mehî de jî li Edenevê listika xwe li pêşberî şânohezîn xwe de bilista. Ji bo vê yekê jî li ser navê Taetra Jiyana Nû Murat Batgi serî li Emniyet û Walîtiya Edenevê û ya Mêrsînê da, lê wan destûr neda ku Taetra Jiyana Nû listika xwe bilize. Walîtiya Mêrsînê nedana destûr bi awaye-kî fermî ji bo wan ragihand lê walîtiya Edenevê hewce nedît ku qedexekirina listikê ji bo wan ra-dighîne jî.

Li ser van qedexekirinan Taetra Jiyana Nû daxuyaniyeke da çapemeniyê. Di daxiyaniye de tê gotin ku: “Heman listik sala par (1998) jî, li van bajaran hatiye pêşkêşkirin û wê çaxê nehatiye qedexekirin.” Daxuyanî wiha didome: “Di vê listikê de tu cudaxwazî nîn e. Ger tê de cu-daxwazî heye fermo em xwe ji bo serdozgerê îx-bar dikin û ger tiştekî wisa di listikê de nîn e, wê çaxê, em jî dibejin; listik tenê ji bo ku bi zimanê kurdî ye, hatiye qedexekirin.”


Her wiha di daxuyaniye de ev rewş tê şermekzarkirin û tê xwestin ku her kes li hemberî vê kîrina anti-demoktarîk hisyar be. Taetra Jiyana Nû diwaze di rojên pêş de li Enqereyê listika xwe pêşkêş bike.

SERWISA ÇANDÊ



ÇAVDÊRÎ

Kongreya Neteweyî
balixbûna
neteweyî ye



MîRHEM YÎÇIT

R oja gelê me li bendê bû, li ber derketinê ye, serê tavê diz-eriqîne û rengekî zêrîn berşefeq dibe. Vê mehî ango gulanê, dê Kongreya Neteweyî bê îlankirin.

Amedehiyen heralî li dar in û li dawîyeke bi xêr nêzîk dîbin. Berê rîexistin û şexsiyeten damezrîner li Brûkselê ye.

Xwezî bi dilê wan kesan ku dê di vê bîstik û kîlîka dîrokê de cihêkî bigirin û şopekê bihêlin.

Xewîn û hêviya sedsalan, daxwaza gelê kurd, rîexistin û bi hezaran şexsiyeten Kurdistanî, mezheb û dînên ji her rengî tên cih, dîbin rastî û dê di dezgehekî welatgîr de bi laş û gewde bibin.

Zemanekî, siyasetmedar û xwendayê kurd li zanîngehan, di semîner û civînan de qirik li xwe diqelaşt da ku îspat bikin ku kurd neteweyek in û Kurdistan yet welat e. Iro qonax cihê ye û êdî mirov dibe şahidê balixbûna neteweyî.

Netewe jî bi giş bir û baskên xwe mîna şexsan rastiyeke biyolojîkî, derûnî û fikrî ne, ew jî distewin, dikemilin. Di nav kurdênu duh û iro de ferqa çêbûye mezin e:

1) Kurd neteweyîtir û Kurdistanîtir in û enterese û berjewendiyen xwe baştıri nas dikin.

2) Di her alî de; di aliye fikrî, siyasî, çandî û diplomatikî de ji her demê zêdetir aqîlê wan ji kîsê wan e û ji xwe bawertir in. Êdî bi navê îslamî, sosyalîzm û wekheviyê, yan jî nîzama nû, xapandina kurdan ne hêsan e.

Heta derecyeke xurt, dîndar û muhafazakarên kurd jî û modernî wan jî, êdî bi çavekî din li meseleyê dinêrin, pirs û pirsgirêkên xwe bi rengekî serbixwetir digirin dest û bi mêzîneke deqîqtir rastî û nerastîyan diwezinînin.

3) Kultura siyasî, bihevrekarkirin û birêvebirinê, hevdûfemkirin û lihevbanîna nav cîl û nîşan, bêhnfirehî û rîzdariya nav dîtin û birêveçûnê cihê lipêştir û xurtir e.

4) Dek û dolab, komployen herêmî û navneteweyî wek dehsal, bîtsal û pêncîsalên berê, hew karin şawşaw û hezmî çêbîkin û kurd di vî alî de jî bûne xwedî tecrube, serpêhatî û konetir bûne.

5) Kurd dagirkir û dijminan, xêrxwaz û mizawiran ne békemânî be jî, bi hawayekî nayê muqayesekirin, ji pêşiyen xwe zêdetir ji hev derdixin û kapasiteya analîzkirin û dersderxistinê li cem beşek mezin ji gel û rîexistinê kurdan hatiye cihêkî ku dikarin Kongreya Neteweyî ava bikin.

Kongreya Neteweyî ku gelê kurd li her parce û aliye welatê me, ne bi du çavan, belê bi çar çavan li bendê ye, dê bibe manîfestoya balixbûna neteweyî, yekîtî û hevdûgirtina kurdan ku mercen bingehîn e ji bo çareserkirina pirsgirêkên navxweyî û navneteweyî.

Koma Medya li ser şanoya Mîrnişîna Baban û ya

Carina em nikarin ti

SERKAN BRÜSK

"Di warê yarmetî, derhêner, dekor û hwd. de pir zehmet e ku mirov bikaribe kesên pispor û şareza peyda bike. Em neçar dibûn ku ji bo hindek karekteran xelkê asayî bi kar bînin. Bo nimûne min bi xwe berê karê şanogeriyê nekiriye, belam ew roj pêwîst bû, em ji bo vî karî amade bin û yarmetiya hevalên xwe bikin."

MEdi Kongreya Înstîtuya Kurdî ya li Stockholmê de biryar dabû ku em komeke şanoyê ava bikin. Hevalên ku dê di beşa şanoyê de bixebitiyana jî amade bûn. Van hevalan tavilê, dotira rojê dest bi xebatê kir û xebata xwe bêwestan û rawestan bir serî.

Xebata van hevalan ji du beşan pêk dihat. Beşa yekemîn provayen normal bûn, ku wan her roja îné li balona biçük a Înstîtuyê pêk dianî. Ez wisa bawer im vê serdemê 89 mehan dom kir.

Piştî ku ev gava pêşîn a hunermen dan çû serî, îcar jî diviyabû hevalan xebata xwe li pêşberî kamerayê berde-wam bikira. Dekor hatin amadekirin, cil û berg bi zor û zehmetî hatin peyda-kirin û bi vî awayî jî, xebata dawîn a şanoyê dest pê kir. Ji bo kişandina dîmen-keke sé şaniyeyî, car caran 78 saet xebat dihâte kirin. Ev dîmen tev, ji aliyê kameramanen MED-TV'ye ve dihatin wergirtin.

Piştî vê xebata dûvedirêj a hûrbînî, berhem niha amade bûye. Bi vebûna televîyonê re, dê berhem di televîyonê de we're pêşkêşkirin. Me li ser xebat û berhem wan, ligel derhênerê komê Mehdi Caf û çend endamên komê hevpeyvînek saz kir.

Mebesta we bi avakirina Koma Medya ci bû?

❖ Mebesta me, bipêşxistina hunera kurdî, zindîkirin û vejandina ferhenga



Koma Medya di bin sîbera Înstîtuya Kurdî ya li Stockholmê karûbarê şanoyê digerîne. Komê li ser dîroka Mîrnişîna Baban şanoyek amade kiriye û ev lîstik dê bo televîyonê jî were pêşkêşkirin.

(kultur) kurdi ye. Her wiha komkirin û handana (teşwîq) hunermendêñ kurd e, ku doza xizmeta welat û neteweya xwe dikin. Weki din, em ditewanin (dikarin) bi riya televîyonê, şanoya kurdi ya li Kurdistanê bi pêş bixin.

Bi qasî ku ez pê dizanim ev yeke-mîn berhema koma we ye. Tu dikarî hinekî behsa "Mîrnişîna Baban" bikî?

❖ Berî êsta (niha) bi du sed salan li başûrê Kurdistanê, li bajarê Silêmanî Mîrnişîneke serbixwe ya kurd hebûye. Ev Mîrnişîn, li ser zorbeyî (piranî) navçeyen kurdnîşîn desthilatdar bûye. Pay-texta wê, di wê katê (dem) de bajarê Silêmanî bûye. Mîrnişîn, ji layê du birayan ve hatiye birêvebirin. Van herdu birayan, li hevdu nekiriye û bi rê neketine, wan yekîtiya mîletê xwe ava nekiriye, lê ji bo desthilatdariya welêt ew li dijî hev rabûne. Van herdu birayan, ji dîvla ku yarmetiya (alîkarî) hevdu bikin, yarmetiya dijmin kiriye da ku hevdu bişkînin. Wê katê, Osmaniyan nedixwest ku Mîrnişîneke kurdan a serbixwe hebe. Ji ber vê çendê, Osmani-

yan bi riya Necîp Paşayê Bexdayî û bi alîkariya yek ji wan birayan, êriş biriye ser Mîrnişîna Baban û desthilatdariya Mîrnişînê têk biriye.

Çêbû. We ji bo ci ev babet (tema) hilbijart?

❖ Ji van şerîn navxweyî, bi tenê dij-minen kurdan kelk (fêde) werdigire û heta radeyekê jî ew bi ser dikevin. Ligel vê yekê mîjû (dîrok) çîma ji aliyê kurdan ve tê dubarekirin? Çîma em dersan ji mîjûya xwe wernagirin?

We ji bo ci, ev şano ji bo televîyonê jî amade kir?

❖ Ji ber ku di vê şanoyê de, nêzîkî 19 caran dekor tê guhartin. Û ev ji bo şanoyê zor (pir) sext û zehmet e. Li layê din bîneren (temaşkar) şanoyê li derveyî welêt zor kêm in. Lî bi riya televîyonê bi milyonan bîner dikarin lê temâse bikin, ci li derveyî welêt û ci li Kurdistanê.

Bi boçûna we, di navbera şanoyeke li ser dikê (sahne) û bo televîyonê de ci ferq heye?

❖ Ew şanoyen ku li ser textê şanoyê têne pêşkêşkirin, divê di kateke (dem) diyarbûyî de bênavber werin qedandin û her wiha dubarekirina wê tuneye. Lî belê li ber televîyonê mirov ditewane (dikare) bêlez û birêkûpêkî tomar bike û bîner jî dikarin gelek caran lê temaş bikin û ji berhemê baştı fêm bikin. Çimkî ev şanonymaya me, weki filmê televîyonê, li pey pîvanen yasayı hatiye tomarkirin (qeydkirin). Belam em ji serî heta dawiyê li stûdyoyê bûn. Deng û reng bi şeweylekî gelekî ciwan û baş hate amadekirin. Ji bo kişandina her dîmenê, ku nêzîkî heft deqîqeyan e, me li dora 10 saetan dîmen wergirtiye. Bi tenê ji bo ku em deng û rengê lîstikê raçav (kontrol) bikin.

Gelo ne baştı bû ku we ev şano li deriveyi studyoyê, weki film bikişanda?

❖ Zor zehmet e. Lewre siruştâ Swêdê bi sanahî (hêsanî) li siruştâ Kurdistanê nagunce. Dîsa pir zehmet e ku mirov wan dekorêñ orjinal, ku li Kurdistanê hene, ji siruştâ Swêdê peyda bîke. Û ev der welatekî tarî ye.

henderanê axivî:

Çirokbejê jî peyda bikin

Carinan li ser tiştekî gelekî basît, problemen mezin ji bo me peyda bûn. Wekî nimûne; peydakirina tizbiyekê ji bo mele bûbû mişkule. Yan jî cil û bergên kurdî. Çimkî ew cil û bergên kurdî ku li vir hene, yên seyran û xweşiyê ne, hinekî taze û ciwan in. Xwediyan van kincan jî naxwazin cilên wan qirêj bibin û biqermiçin.

Baş e. Peydakirina dekor û aksesu-en wê serdema ku bûyer lê derbas ye, ji bo we ne zehmet bû?

❖ Danîna dekor ne gelekî zehmet. Belam aksesuar gelekî zehmet bû. Arina li ser tiştekî gelekî basît, giriftên problem) gewre (mezin) ji bo me duş bûn. Wekî nimûne; peydakirina tizbiyekê ji bo mele bûbû mişkule. Yan jî cil û bergên kurdî. Çimkî ew cil û bergên kurdî ku li vir hene, yên seyran xweşiyê ne; hinekî taze û ciwan in, xwediyan van kincan jî naxwazin cilên an qirêj bibin û biqermiçin.

Wekî din çi gîrûgiriftî li we qewi-
mî?

❖ Gîrûgirifta aktoran. Ji ber ku me nek aktor peyda nekirin, ji neçarî me nek dîmen kurt kirin û bi vî awayî me rebata xwe bire serî. Lewre wexta hineyan zor kêm e. Ü wekî din jî holeke (sâman) me ku em bikaribin hemû kat lê rovayê xwe bikin, tuneye.

Esta jî ez hez dikim ligel şanogerên biaxivim. Sereta dixwazim ji Kak adil bipirsim. Tu dikarî hinekî behsa ola xwe "Qale" bikî?

❖ Qale mirovîk xweperest e û berwendiyênen xwe yên kesanî di ser ên işte re dibîne. Li ber vê, ev karekter ek ji mirovîn helperest, fitnekar e ku şeşeyan alozter dikin. Ev rol li dijî şexiyeta Adil e. İcar ji ber vê çendê ez niyârim bibejim min wekî aktor karekter kir, da ku ev karekter were şeşkêşkirin. Kesayetiyen wekî Qale, şeguman li darê dinyayê peyda dîbin.

Birêz Hamîd Derûdî hûn di şanoyê de bi rola çirokbejiye rabûne. Erk û dewra çirokbejî ci ye?

❖ Çirokbej di şanoyê de xwedan dewreke girîng e. Belam pêkanîna rola çirokbej ne gelekî sext û dijwar e. Ji ber ku çirokbej, behsa rûdanîn girîng ên wê serdemê dike, ku şano li ser hatiye duristkirin. Ew jî serdema Mîrnişîna Başan e, ku di mîjûya kurdan de û bi taybet jî li Herêma Soran girîngiyeke wê a taybet heye. Çirokbejî, di komel û folklor me de cihekî esasî û sereke di-

gire. Çimkî êsta jî, li her gundekî Kurdistanê çirokbêj, bo xelkê, behsa mîjûya kurdan û Kurdistanê dikan.

Ez di warê peydakirina cil û bergen de neketim tengasiyê. Çimkî ev cil û bergen çirokbêj li nik min hebûn. Mesele wekî yên Feqiyane, Kulebaw, Kilaj û Kilaw û hwd. Ev cil û bergen resen ên kurdan li cem min hebûn. Ji bo jibekirina (ezberkirin) testê şanoyê jî, hîc mişkuleyeke min tunebû, çimkî li malê, min ligel Semîre prova dikir. Dannûstandineke zor baş di navbera me de hebûn. Min cara pêşîn ligel swêdiyan karê şanogeriyê kiribû belam (lê) ev yekemîn car e ku ez li derveyî welêt di şanoyeke kurdî de dilîzim.

Hevala Semîre tu di nava komê de ya herî ciwan î. Ji bo te lîstina vî karakterî çawa bû? Ci zehmetî û xwesiyyen wê hebûn?

❖ Lîstina karakter bo min pir xweş bû. Ji ber ku ew kesen ku guh li min dijirtin, hemû ji min gewretir (mezin) bûn, min wisa hîs dikir ku ez zor gewre bûme. Ev jî, ji bo min cihê şanazî û serbilindiyê ye. Ev cara duyemîn e ku ez di şanoyeke kurdî de dilîzim. Yekem car, ji bo Cejna 8'ê Adarê li başûrê Kurdistanê li Çiyayê Qendîl min rol wergirt. Bi giştî şano, ji bo min bi serketî derbas bû.

Kak Samed tu wekî rêveberê şanogeran, li ser şanoyê û rola xwe çi dibêjî?

❖ Li henderanê (xerîbiyê) karê şanoyê ne hîsan e. Çimkî jiyan bi xwe zehmet û sext e. Paşê, ew aktor jî li bajar û welatên Ewrûpayê belav bûne. Zor zehmet e, ku mirov bo karê şanoyê wan ko (teşwîq) bike.

Di warê yarmeti, derhêner, arayış, dekor û hwd. de pir zehmet e ku mirov bikaribe kesen pispor û xwedanşarez peyda bike. Em neçar dibûn ku ji bo hinek karekteran xelkê asayı (sivil halk) bi kar bînin. Bo nimûne min bi xwe berê karê şanogeriyê nekiriye, belam wê rojê pêwîst bû, ku em bo vî karî amade bin û yarmetiya hevalên xwe bikin.

Ez di rola serleskerê Necîp Paşa de

bûm, ku Mame Yare ew zindan kiriye, li benda biryara Paşa dimîne, aya dê wî bikujin an nekujin. Ü bi vê rolê jî, kuta-hî li şanoyê tê.

Helbet lîstina karekter ji bo kesekî wekî min ku yekem car roleke wisa dilîze, bi taybetî ne hîsan bû ku li pêşberî kamerayê rawestim. Belam piştî ku karek tewaw bû û min encam û berhemâ xwe dît, bo min tiştekî zor xwes bû.

Kak Efân te jî rola Necîp Paşayî girtibû ser xwe, der barê şanogerî û kesayetiya Necîp Paşa de tu ci dibêjî?

❖ Bi raya min Necîp Paşa semboleke bo her yekî ji wan serkirdeyên dagirker ku li Kurdistanê xwedi erk in, ji bo ku bikarin cihê xwe û desthilatiya xwe li Kurdistanê qewî bikin. Ji bo vê yekê wan pêwîstî pê hebûye, zêdetir rayeya xwe bi tund û tûjî bi kar bînin. Di vê rî de jî wan serê bi hezaran kesen sivil û xelkê şoresser ku li dijî mebesta wan rabûne jê bikin, ter û hişk bi hev re bisotînin. Ji bo min rola Necîp Paşa ji sedî sed ev bûye ku heta êsta jî, berde-wam nimûneyî ew dagîrker li Kurdistanê têr dîtin.


Di şanogeriyekê de hest dikim Paşa rewseke alozî ya derûnî de dijî. Di warê dozandina çareseriye de ew tenê li riya kuştin û li jinavbirinê dizanin.

Roje Xan, tu jî bi rola Qemernaz rabbûyî. Tu dikarî li ser Qemernaz û jina kurd ci bibêjî?

❖ Ez wekî afreteke (jin) kurd, hez dikim besdariyê di karê şanoyê de bikim. Ev duyemîn car e ku li Stockholmê ez besdariyê di şanoyê de dikim. Ji ber ku di warê şanogeriyê de rola jîna kurd kêm e, ez besdariyê di karê şanoyê de dikim. Ez bi rola Qemernaz pir kîfxweş bûm. Hêvîdar im ku rola afreta kurd, dê di warê şanogeriyê de pêşketitir be.

Birêz Caf me dil heye hûn dawiyê li ser şanoya kurd û projeyen xwe yên bo pêşerojê me agahdar bikin?

❖ Berî her tişti ez dixwazim diyar bikim, şanogeriya li henderanê ji ya li Kurdistanê zor zortir e. Sext û zehmet e.



Mehdi Caf

“Ez di sala 1962’yan de li bajarê Helepçe li bâşûrê Kurdistanê ji dayik bûm. Ü li sala 1985’an min Înstîtuya Hunerên Ciwan a Kurd beşa hunera şanoyê tewaw kiriye, ku pênc sal bû. Piştî ku min ev beş kuta kir, min Kurdistan li cih hişt û di sala 1988’an de li Sovyetê li beşa sînemayê min dersên rejîsoriyê xwendin. Dûvre min filmekî nîv saetî, ku sîh û pênc mîlîsine-mayî dokûmentar e, li ser Kurdistanê bi zimanê rûsî durist kir.

Li Kurdistanê min her karê şanoyê durist kir. Ez di sala 1990’î de bo Swêdê hatim û li Swêdê jî her karê şanoyê dikim.”

Li layê din ger berpirsiyaren Înstîtuya Kurdi ya li Stockholmê bi dilgermî berê xwe bidin xebata şanoyê û problemen aktorên kurd çareser bikin, wê ji bo diwarojê jî rî vebe. Em gelekî dixwazin berdewema xebata xwe bînin û berhemên din durist bikin.

Ez wekî gotina axîrî dixwazim spa-sî Înstîtuya Kurdi ya li Stockholmê û karmendêن Stûdyoya MED-TV’ye bikim.

Nirxandina

Romana Kurdi:

Bîra Qederê

AMED TÎGRÎS

Mijara Bîra Qederê, jiyanen entelektueli û têkoşina Mîr Celadet Bedirxan e. Ji bêplaniya nivîskar, di 260 rûpelên romanê de zîrekî, hunermendî û entelektueliya Celadet Bedirxan û her wiha Mala Bedirxan baş nehatiye zelalkirin. Bi awayekî amatorî, bi mijarê qels û bi gotinêne di cih de dawî li romanê tê. Di romanê de teknîkeke balkêş, ku xwendevan bixe heyecan, lêgerîn û xwendinê nehatiye bikaranîn. Nivîskar Mehmet Uzun, bi idâyeke entelektueli dest bi jiyanen malbata entelektuelen kurd kiriye, lê radeya zanîn û zimên basîd û nizm e. Her wiha metodên nivîsin û gotinê jî gelek basît in. Wekî gundiyeke nezan, bi devkî behsa kesekî/ e an jî bûyerekê bike. Nivîskar, xwestiye bi kanîna bêje û hevokên ewrûpî, reng û dengê entelektueliyê bide xwe û Celadet an jî romanen xwe. Wekî ku kurd dibêjin "navê giran e, gundê wêran e."

Di destpêka romanê de, carek an du caran derbas dibe ku, di mala Bedirxan a Stenbolê de mamosteyen fransî û italî hebûne, lê ne wekî dersdar wekî xizmetkar li zarokên wan nihîfîne. Celadet û Kamûran li wir dest bi dibistana seretayî kiriye. Piştre Celadet li Stenbolê di rojnameyekê de dest bi kar dike. Heta rûpela 119'an ku her du bira çûne bajarê Munîhê û li wir dest bi zanîngehê kirine. Di vê beşê de başebas behsa Zanîngeha Munîhê jî nayê kirin, lê behsa restoranta zanîngehê, belengazî û xizaniya wan a li malê hatiye kirin. Li wir Kamûran doktoraya xwe temam dike, lê Celadet, wekî bi tenê here kursa zimanê almanî. Li mala xwe wergera teks û helbestê fransî dike û li muzîka almanî û fransî guhdariyê dike.

Gelo li welêt ci xwendin, zanabûn û zirekbûna wan ci bû? Kîjan dibistan qedandin, bi çend zimanen dizanibûn? Bersiva van pirsan tune ye. Lî ew li Almanyayê Nietzsche dixwîne û di bin bandora dîtin û felsefeye wî de dimîne.

Nivîskar, ji destpêkê heta dawiyê, behsa xizanî û belengaziya Celadet û Kamûran dike. Lî, ew ji bîr dike ku ew cil û bergêñ herî biha û bi qelîte li wan dike. Her du birayan di otelêñ herî luks de bi cih dike û di restoran û meyxaneyen herî asortik û luks de dide xwarin û vexwarin. Celadet, xwedî çend dost û yaran e. Ew, tu caran li ser sendelye û palgehêñ (koltuk) qedîfe û textîn rûnanin, lî li ser yêñ çermîn rûdin. Ne li muzîka kurdî, li ya ewrûpî, li Beethoven û Mozart guhdariyê dikan.


Hema hema di her beşa romanê de, çend bêje an jî hevok bi îngilîzî, almanî an jî bi italî hatine rêzkirin. Wiha xuya ye ku, nivîskar xwestiye di şexsê Celadet de, ji xwendevan re sînyala pirzimanzanî û entelektueliya xwe bide şandin. Roman, bi gotina almanî ya "mehr licht" dest pê dike û dîsa bi wê diqede.

Deftera Cananê

Dîmen û bûyerên seyr û ne rast di romanen Bîra Qederê de derbas dîbin. Canan, yara yekemîn a Celadet Bedirxan e. Dema hîn Celadet li Stenbolê ye, Canan wekî yadigar, deftereke bîçük a bêrîkê dide wî. Celadet dema li Stenbolê ye, dest pê dike û li wê defterê gelek tiştan dinivîse. Ew, piştre tê Almanyayê, çar salan jî li wir dimîne. Her ku Cananê bi bîr tîne, deftera wê derdice û lê dinivîse. Piştre diçe Misirê, Beyrûdê, Şamê, Behdînanê li wir jî defterê bi kar tîne. Belê, 20 sal derbas dîbin hîn jî li defterê dinivîse. Baş e ku, rojekê defterê winda dike, an dê heta roja ku biketeya bîrê û biçüya ser heqiya xwe jî lê binivîsanda.

MEHMED UZUN

Bîra Qederê



Tevliheviya bûyeran

Di rûpela 155'an de Celadet, Ekrem Cemîlpaşa, Qadrî Cemîlpaşa û hevalen xwe, li Hesîcê ji bo plana êrîşa li ser Tirkîyeyê, bi şev û roj dixebitin. Hîn bâbet naqede, di rûpela 158'an de dinivîse ku kurd xayîn derketin, bi dewletê re yekbûn, hînek ji wan endam û berpirsiyaren rêxistina Xoybûnê, ji bo parastin û vejandina mîrîtiyêñ bav û kalîn xwe bûbûn serokê rêxistinêñ kurd. Ew plan û programa Xoybûnê dijine waliyê Mîrdînê. Ji aliye din ve

300 lîrayen Xoybûnê di klûbêñ Lubnanê de dixwin.

Li vir, dijberî û tevliheviyeke mezin heye. Nivîskar, bi devê Bedirxaniyan, sûc dike stûyê hinekêñ ku kurêñ mîr û paşa ne û bi Dewleta Tirk re dixebitin. Lî belê ku kurêñ paşan ew bi xwe ne. Li gorî hînek kes û dokumenten dîrokî, hînekan ji wan bi xwe pereyên Xoybûnê xwarine. Ji ber ku berpirsiyare karûbarê aborî ew bi xwe bûn. Nivîskar, bi zanabûn an jî bi nezanî vê rastiya dîrokî serobin dike.


Ziman, rastnivîsin û bi karanîna bêjeyan

Zimanê nîvîskar gelekî jar û seqet e. Ew, ne hakîmê zimanê kurdî yê edebî ye. Zimanê wî, zimanekî req û ziwa ye. Ji aliye dewlemendî û rengîniya bêjeyan ve, ziman gelekî teng û bi sinor e. Ev ne zimanê romanê ye, zimanê belavokê ye. Heger mirov bi teknîka nûjen bixwaze lê bikole, ku ka nivîskar çend gotin di romanê de bi kar anîne, ez bawer dikim, ku dê hejmara gotinê wî ji sê—çar hezarî derbas nakin. Gotin ne dubare sedbare bûne. Rengdîren ku ji bo teswîrê hatine bikaranîn, gelo çend in? Hema hema di her rûpelê de, ev gotin hatine dubarekîn: Çoş, boş, bîhîstiyar, lûlû, yaqûd, stûr, yekta, bêpayan, perekende, spehî, rind, mist, difûre, dixuyîn, pê... Di romanen nivîskar ên "Tu" û "Siya Evînê" de jî, bi heman bêje û hevokan teswîr hene.

Çend bêje û hevokên şas

...Li ser şîva êvarê (rp. 40). Şîv ji xwe navê xwarina êvarê ye. Êvar li vir zêde ye û şâş e. / Ji mêj ve bû ku zimanê hesûd û zikres li Stenbolê belav dikirin ku sultan dê malbata Bedirxan surgun bike. (rp. 43) / Fesan mîna helaliyêñ sor, hemû salonan tije kirine. (rû 44) / Dolbebexçe, salona herî xweş û mezina hemû Avrûpayê bû. Wekî zanîn û agahdarî ev ne rast e. Ji aliye dîrok, huner, spehî û meziniyê ve, ne yek bi hezaran salon û xanî li Ewrûpayê hene. / Kevirêñ lûlû û yaqûd ku bi texten zérîn hûnadine, rengên têkel ên spehî didin têx. (rû 44) / Piraniya şeniyen ku hatine xort û xwendevan in. Yanî dixwaze bêje, ku piraniya ew kesen ku hatibûn ciwan û xwendekar in. Şenî nifus e û xwendevan jî telebe ye. /

Porê wê mist da. (rp. 50) Ji pêncî carî bêhtir gotina "mist" di şûna gotina "mîzdanê" "de, bi çewtî hatiye bikaranîn. / Alî Şamil Paşa li zîndanen Trabîlîsgarbî wefat kiriye. (rp. 55) Gelo mirov dikare di heman demê de, di çend zîndanan de bimire? / Kevirêñ pêpêlûkên nerdewanen bi kirêca spî hatin



Mehmed Uzun

qaîm kirin. (rp. 57) Ma pêpelik û nerdawan ne heman tişt in? / Dîsan jî difinêñ poz jê baş dixuyîn. (rp. 62) Hal bû ku difin, poz, bêfil, kepû û lût hevwate ne, ya bi tirkî eşanlamlı ne. / Xortekî ji xwe bawer, emîn, razî, têgehişti, jî, bikêr, xurt, lê di eynî wextê de saf, bi heyecan, ziravbihîstiyar. (rp. 64) Ez bawer nakim, ku kes rastî teswîrekê wiha seyr hatiye û bê. Ka de vê hevokê wergerîn zimanekî din, dê wê demêçi derkeve holê? / Porê reş ê henekirî. (rp. 64) Gelo heneya reş jî heye? Çend zapit li pê ne, paşıya wan li Celadet e. (rp. 85) Qedrî û Ekrem began di gotin ku. (rp. 145) / Bi çavêñ germ li hevdî dînîhîrin û difikirin. (rp. 119) Çavêñ wê mîna zeryayeke stûr e. Zerya yanî derya, behr. / Mêkew û mariyên xwe bifiranda û li wan binêriya. (rp. 202) "Mêkew" û "marî" eynî tişt in. / Celadet destê xwe bi ku de davêje, bi tenê valahî tê destê wî. (rp. 145) / Ez bi gul, kulsîk û çîçekên hewşê daktebiûm. (rp. 210) / Zimanê kurdan hatibû jêkirin, kîlît li zimanê wan xistibû. (rp. 211) Yê ku nizanibe dê bêje qey pêşî zimanê Kurdan jêkirine û piştre qulkîrine û kîlît lê xistine? / Em bîreke yekta bikolin, aveke boş derxînîn û emê pembûyeke baş rakin. (rp. 239) / Gava şivan kerîyen pêz ji çêrî dianî, teyrê eylo û bazan jî, mîna müyekî xwe ji tehtan berdidan jêr. (rp. 228) / Pere nîn bû, imkan nîn bû xwarin û nîn bû... pere nîn bû, imkan nîn bû xwarin û nîn bû, zor zilum, tirs û xof bêpayan pir bûn. (rp. 229) /

Ev bêje û hevokên şas ên ku min yek bi yek li jor rêz kirine, ne şâşiyen daktilo û yêñ çapê ne, yêñ rastnivîsin û rîzimanî, nezanabûn û nenaskirina bêjeyan e, ku mirov wan li ku û çawa bi kar tîne.

Gelê Îsraîlê riya danûstandinê vekir: Li Îsraîlê Partiya Karkeran bi ser ket



★ BEŞA NÜÇEYÊN DERVE

Di hilbijartina gişti ya Îsraîlê de, ku roja 17'ê mehê pêk hat, kevnefermandar û peyrewê Îzak Rabîn, Ehûd Barak bi ser ket. Barak, serokatiya Partiya Karkeran dike û ev partîji pêşengîya bloka bi navê "Yek Îsraîl" dike. Vê bloka ku ji sê partiyen pêk tê, ji hilbijartînê ji sedî 57'ê dengan wergirt. Partiya Likûd, ku serokatiya wê serokwezirê niha Netanyahu dike, ji sedî 43'ê dengan wergirt. Li ser vê yekê Netanyahu ji serokatiya partiyê istifâ kir. Pişti hilbijartînê, di nava parlementoya Îsraîlê ku ji 120 endaman pêk tê de, Partiya Karkeran 31 endamtî, Partiya Likûdê 18 endamtî û partiya cihûyen tundraw Şasê 15 endamtî bi dest xistin. Endamtyen din ji man ji 12 partiyen mayî re.

Li pey agahîyen ku bi dest ketine, biserketina Barak ji her kesî zêdetir kêfa Serokê Amerikayê Bill Clinton anî. Hata gotin ku wî pîrozbahîyen xwe yên germtirîn pêşkêsi Barak kirine û hêviya xwe ji bo xebateke baş, di riya aştiyê de, aniye zimên. Clinton dixwaze ku Barak, bîryara lihevruñiştina Wye River bîne cih. Di vê lihevruñiştinê de bîryar hatibû dayin ku Îsraîl di nava 12 hefteyan de % 13'ê Şerîaya Rojhîlat ji rîveberiya Filistinê re bihêle. Lê Netanyahu ev bîryar pêk neanî, bi tenê % 2'ye herêmê vala kir. Li cihê mayî ji giranî da avakî-

rîna malan ji bo cihûyan. Niha tê hêvíki-rin ku pişti Barak xebatê aştiyê lez bigirin.

Ehûd Barak, pişti ku encama hilbijartînê diyar bû, civîneke çapemeniyê li dar xist û di vê civînê de da zanîn ku di nava salekê de wê kêşeyên girîng ên Îsraîl bixe riya çareseriye. Serokê Partiya Karkeran Barak, digel hevdîstina bi rîveberiya Rêxistina Rizgariya Filistinî re, hevdîtinê bi Sûriyeyê re û di nava salekê vekişandina hêzên xwe ji başûrê Lubnanê ji wekî armanc daye ber xwe. Lê gelek kesen pispor diyar dîkin ku ew nikare di vê maweyê de bigihêje mebes-ta xwe, her wiha hînek kes didin zanîn ku Îsraîl karê hevdîtinê bi Filistinîyûn û Suriyeyê re nikare bi hev re bimesîne. Bo nimûne Joel Singer ku di hevdîtinê li Osloyê de cih girtiye û niha jî li Washingtonê parêzeriyê dike, daxuyandiye ku meşandina her du karan li Îzak Rabîn giran hatiye û ji bo Barak ji ev bar giran e. Rêveberê İnstutiya Rojhîlat Nêzîk ya Washingtonê Robert Satloff jî dide zanîn ku, Barak nikare di nava salekê de kêşeyên li ber xwe çareser bike.

Barak kevok e yan baz e

Biserketina Ehûd Barak, rîveberiya Filistinê ji kêfxweş kir. Her wekî Clinton, Yaser Arafat ji telefonek da Barak û ew pîroz kir. Gelek mirovîn filistinî ji kêfxweşya xwe li ser vê serkeftinê anî ser zimên. Kesen ku bi çavekî çakbînî li ser Partiya Karkeran û serokê wê Ehûd

Barak dinêrin, bi bîr dixin ku ew partiya Îzad Rabîn e, ku ji ber aştxwaziya xwe ji hêla yekî tundraw hate kuştin. Daxuyaniyê Barak û helwesta alîgîrîn wî ji vê rastiyê diselminin. Berî nîvê şeva hilbijartînê ku encam diyar bû, girseyeke mezin li Qada Îzak Rabîn li hev civiya û sloganâ bi rengê "Em bi ser ketin" hilda.

Ezmûn û gotinê Barak hêviyê didin hînekan, lê hînek jî bi şik û guman li wî dinêrin. Lewre ew bi bîr dixin ku Barak kevnefermandar e û di dema hilbijartînê de jî ev aliyê xwe derxistiye pêş. Her wiha, wî ji ber peymana Osloyê ya 1993'yan Îzak Rabîn rexne kiriye. Hînek gotinê wî yên hilbijartînê vê şik û gumanê zêde dîkin. Ew, bi tundî li dijî parçebûna Qûdîsî derket û da zanîn ku ew bajar dê her tim wekî tekane serbajarê Îsraîlê bimîne. Hînek Filistinî bawer in ku leşkerbûna wî li paş maye û iro dê ji bo aştiyê hin gavan bavêje. Hînek jî dibêjin tiştek naguhere, zêde cu-dati di navbera Netanyahu û Barak de nîn e. Bo nimûne Iyad Xamîsê 26 salî ku li Ramallahê bazirganiyê dike, gotiye: "Ji bo me her du jî dijmin in. Yek ji wan hikûmeta tundraw û olperestan e, ya din jî hikûmeta general û mirovîn artêşê ye. Li gorî me her du jî xwedîye heman polîtîkayê ne."

Lê dîsa piraniya gelê Filistinê di wê baweriyê de ye ku, kî were ser kar ji divê hin gavan ji bo aştiyê bavêje û ji bo vî karî jî Barak ji Netanyahu çêtir e.

DI ÇAPEMENIYA CİHANÊ DE KURD

Doza Öcalan lînceke veşarı ye

✓ Rojnameya Le Soirê di hejmara xwe ya 15-16'ê gulanê de nûçeyeke şîroveyî li ser doza Öcalan weşandiye. Rojnameyê daye zanîn ku li Tirkîyê siyasetmedarên tirk, medya û dewlet gîs dixwazin Öcalan ji holê rakin. Ev ji rengekî komîk dide darîzandinê. Di nava nûçeya ku ji hêla Eric Biegala ve hatiye nîvîsandin de, li ser pest û pêku-tiya ku li parêzeran tê kirin jî hatiye rawestandin. Her wiha hatiye gotin ku hînek kesen ku girêdayî Şaxa Taybet a Ser in, her roj dicin Öcalan hildidin bin pirsan û bi dermanan bi tenduristiya Öcalan dilîzin. Di dawiyê de hatiye gotin ku doza öcalan dişibe lînceke veşarı.


Televîzyoneke nû ya kurdan vebû

✓ BBC'ye li ser televîzyona kurdî ya ku nû vebûye CTV nûçeyek amade kiriye. Di nûçeyê de tê gotin ku televîzyoneke ku navenda wê li Îngilistanê ye, bo 20 milyon kurdên li Ewrûpa, Rojhîlata Navîn û Asyaya Navîn dest bi weşana ezmûnî kiriye. Di nûçeyê de hatiye daxuyandin ku CTV rojê 6 saetan bi zimanê kurdî, tirkî û erebî weşanê dike û di weşanê wê de bi tenê bernamayê çandî cih digirin, nûçe û bûyerên aktüel hê di televîzyonê de nehatine weşandin. Di nûçeya BBC'ye de qala girtina MED-TV'ye jî hatiye kirin û idayê Tirkîyê yên der barê MED-TV'ye de jî hatine dubarekirin. Li gorî nûçeyê tevî ku tu têkiliya wê televîzyonê bi MED-TV'ye re nîn e ji, rayedarê dewleta tirk bernamayê CTV'ye jî ji nêzîk ve dişopînin.

Li bajarêni kurdan neteweperwerî li dar e

✓ Nûçegihanê rojnameya New York Timesê Stephen Kinzer roja 16'ê gulanê li ser Amedê nûçeyekê çavdîrî amade kiriye. Di vê nûçeyê de tê gotin ku li bajarêni kurdan hestêni neteweyî bilind in û piştevaniya gelê kurd ji bo PKK'ê gelek e. Bi bawerîya Kinzer kurd bi doza xwe hesiyane û "gelekî dijwar e" ku mirov yekî e ku doza neteweyî naparêze, heta piştevaniya şerê çekdarî (ya ku destpêka wê 1984 e) nake, peyda bike." Nûçegihanê New York Timesê daye zanîn ku heta mafêni kurdan neyên dayin dê şer bidome. Kinzer, cudatiya helwesta kurdan û tîrkan a li hemberî Öcalan jî bi van gotinan diyar kiriye: "Berevajî tîrkan ku Öcalan wekî mîrkû bi nav dîkin, gelek mirovîn li vir dema çeli Öcalan dîkin, dibêjin 'Serokê me'."

Arjen xêz dike Neşe dixwîne



DEMSALÊN SALÊ

Şev û roj û meh û sal
Mezin dibim sal bi sal
Temenê min pir ciwan
Hê nebûme pîr û kal

Demsalên salê çar in
Hersê çar jî diyar in
Didin me av û xwarin
Adan in deşt û newal

Bi xêr hatî bîharê
Xemîlin guliyêñ darê
Sibê, nîvro êvarê
Dixwînin teyr û sewal

Havîn e, dema kar e
Ceh û genim li dar e
Derdor toz û xubar e
Tu kesek nîn e li mal

Payiz bi xêr û bêr e
Kewara zîv û zêr e
Hezar spas ji wê re
Nehîstîn derd û mital

Sar û seqem zivistan
Berf nizane rawestan
Tev bilîzin bêwestan
Spî bûn kaş û kendal

ZIMANÊ ME KURDÎ YE

Welat, ziman û dîrok
Çand û huner û çîrok

Zimanê me şêrin e
Wêjeyî û zengîn e

Bo lênuşk û pirtûkan
Pênuş bidin zarokan

Jin û mîr,
mezin-bîçük
Qîz û xort û keç û
bûk

Binivîsin bixwînin
Pêşerojê bibînin

Tîp û kîte û hevok

Tiştonek û metelok

Peyv û gotar û wêje
Qise mamik û bêje

Nîqaş, gotin, serborî
Guftûgo û raborî

Stran, helbest û
destan
Hemû nirxên
Kurdistan

Nîrîn û hest û raman
Tu car nabin bêziman

Hîn bibin van
hemûyan

Berhev kin ji çar
aliyan

Ziman her tiştî me
ye
Bihgeha nirxên me
ye

Gava ku hûn dicivin
Bi kurdî biaxivin

Ger dixwazin hûn
hebin

Azad û serbixwe bin

Li ziman bibin xwedî
Pir bixwînin bi kurdî.

12 meh

Meha yekem rîbendan
Bi xebat û berxwedan

Resemî ye ya li dû
Temen kin bû, hat û çû

Meha sêyem adarê

Da mîzgîna bîharê

Avrêl derdor xemiland
Deşt û çiya ediland

Navê meha din gulan
Bû evîna bilbilan

Pûşper meha şesemîn

TISTONEK

Tîşto tişto
Tiştonek
Ber kevirê xiştonek
(Seytanok)

Es manê darînî
Berfê dibarînî
(Moxil)

Le mê lem da,
behîrê kef da
Mar hat, masî di
dev da
(Lemba)

Ez li ser
Zinarekî

Min kuta biz-
marekî
Deng çû heft û
yek hezarekî
(Brûsk)

Tîştekî min heye

Ser textik e, bin
textik e
Çilo dixwe, ne
karik e
(Kûsi)

Di zîka daniye
ser xêniye

(Şîrk)
Bi ro gewras e
Bi şev xatûn e
(sivînek)

Sîn sino, erdê
Kuno
(mîsk)

Se rbikê min
heye, dû av
Dikim nakim, ava
wê li hev nakeve
(hêk)

Ku mî hûtik,
tije nûtik
(hejîr)

Se rî mar e, ne
Diçêre ne kar e
Çar pê ye, ne
dewar e
(fil)

Be la bela bel
dike

Pê şîya leşker
vedike
(bişkul)

BERHEVKAR:
BÊRÎVAN ÜLGEN

Dar û ber tev kemilîn

Germ û tîna tîrmehê
Aram bikin vê mehê

Gelawêj bo me jîn e
Ew "Gula Yekemîn" e

Meha nehan rezber e
Pelê daran mezer e

Kewçêr, meha berhemdar
Miş bûne den û kewar

Sermawez ne pir sar e
Baran, bêdeng dibare

Berfanbar hat, mehiya
Sala me li vir qedîya

NAVÊN ROJAN

Yeksem, duşem
Sêsem li cem
Çarşem xebat
Pêncsem lebat
În westiya
Şemî nehat
Bo hemûyan
Şemî civat

Jiyana Rewşen derket

Hejmara Jiyana Rewşen a avarêlê mehekê bi derengî derket pêşberî xwendevanê xwe. Di vê hejmarê jî wekî hejmarê berê nivîskar bi xwendevanê cur bi cur besdarî kovarê bûne. Di vê hejmarê de jî Feqî Husêni li ser exsîyetên kurd bi awayekî portreyî nivîsiye. Feqî Husêni di nivîsa xwe ya bi emavê "Baba Tahîr" de jiyan, berhem, û ramana Baba Tahirê Hemedanî axistiye ber çavan. Her wiha Husêni ji selbestê Baba Tahîr çend mînakan jîşkêşî xwendevanan dike.

Nivîseke din ku balê dikişîne ser we, gotara bi sernavê "Roman: Sembola Netewetiyê ye" ye. Gotarî aliye Ahmed Pelda ve hatiye nivîsandin. Pelda di nivîsa xwe de swestiye rewşa romana kurdî raxe ber çavan. Lî di nivîse de ev yek jî xuyakirin ku Pelda, hem ji jîvajoya peydabûna romana kurdî, hem jî li ser pêşketina di salên awîn de ne têr agahdar e û li ser romanê, ji taybetî jî li ser romana kurdî ne wediyê zanîneke xurt e. Her wiha di gotarê de zimanê herêmî hatiye kîkarânîn, ev jî li zimanê gotarê nagunce. Di vê hejmarê de li ser çîroka bi sernavê "Şerê Navxweyî" yê Liam O'flaherty ku ji aliye A.Rahman Çelîk ve hatiye wegerandin, mirov dikare çend iştan bibêje. Çîrok li ser şerê Komarperweren îrlândî û Britanyayê hatiye nivîsin. Çîrok hem ji aliye tevnê, hem jî ji aliye wergerê ve biserketî ye.



Di hejmarê de çewtiyên rastnivîsi gelekî diyar in û dîkin ku xwendevan li nivîse bisekinin.

Ji bili van nivîsan çend nivîsên ku di hejmarê de cih digirin ev in: Huner û Gel (Medenî Ferho), Jana Zirav (Behçet Deniz), Vegera Spartakûs (Talip Kalîn), Mirina Evîndaran (helbest -Charles Baudelaire), Gornebaşê (helbest-Emîn Bozan), Di şeftîn esmîn de birûskêñ dîlgirtî (helbest-Rînas Jîyan)


SERWÎSA ÇANDÊ

'Her roj qurm li ber avê nayê'

HASAN KAYA

Dema ku lehî radibe, tevî gelek tiştan bi xwe re qurmên daran jî tîne. Gelek kes wan qurman berhev dîkin, ji bo ku wan wekî ardû bi kar bînin. Mirovîn ku bi kérî keysê nayê, ji vê lehiyê súdê wernagirin. Piştî ku lehî disekine, hînek jê çav li qurmê ku cîranêwan berhev kirine dîkin û poşman dibin. Ji xwe re dibêjin; heyf û xebînet! Çima me jî ji xwe re qurm berhev nekirin. Ji bo rewş û kesên wiha gotineke pêşîyan heye ku pir di cih de ye: "Her roj qurm li ber avê nayê".

Di jiyana rojane de, tiştîn wiha têne serê me hemûyan. Gelekan ji me, fersendê ku di jiyana wan de pir girîng, ji dest berdane. Di azmûnan de di nav pîrsan de, ya rast em wekî navê xwe dizanîn, lê heçku dengekî nepenî bibêje 'ew a din rast e', wê reş bike. Dawî, ku em pê dihesin ku beşa ku pêşî em li ser fikirîne rast bûye, me belasebeb bi ya wî dengê biyanî



Vateya demsala biharê derket



Wiha têkiliya gorankî û kîrmancî jî bi mînakîn cur bi cur li ber çavan hatiye raxistin. Tê dîtin ku berevajî idîya hinêk ziman-zanan, hatiye gotin ku her du zarava dûrî hev in û zaravayê kîrmancî zaravayekî bakurê Kurdistanê ye.

Nivîsa duyemîn a li ser zimên dîsa ji hêla Malmisanij ve hatiye amadekirin. Ev nivîsa bi navê "Derheqê dimilkiya Aksaray de" ji kovara Bîr Nebûn hejmara 7'an hatiye wergirtin û ji tirkî hatiye wergerandin. Nivîskarê nivîsê Memê Hilkecîkî ye. Nivîseke din a lêkolînî jî li ser dîrokê ye. Ev nivîs jî ji kovara War hatiye wergirtin û ji zaravayê kîrmancî hatiye wergerandin. Nivîs, li ser bûyera Seîd Elçî û Dr. Şivan e. Nivîskarê nivîsê Şakîr Epözdemir e.

Ji bili van nivîsên li ser zimên, çend helbest û çîrokan jî di vê hejmarâ kovarê de cih girtiye. Ji van, çîroka Munzur Çem a bi navê "Hewnê Newrozê" balkêş e. Di çîrokê de pîrozbahiya cejna Newrozê ya piştî rizgariyê hatiye vegotin.

SERWÎSA ÇANDÊ

kiriye, em xwe dixwin, lê êdî dermanê çewtiyê nîn e. Em nikarin vejerin serî, fersend mîna çûkê jî nav lepêne me fîriya. Ji van rewşen wiha re gelek nav hatine dîtin. Hînek dibêjin çarenûs e. Dema ku fersendê bercidin jî, dibêjin çarenûsa me reş e. Hînek dibêjin şens û bext e. Lewre jî ji rewşen wiha re dibêjin bextê me kor e. Hînek jî her tiştî diavêjine stûyê felekê. Dibêjin felekî çavén te birjin... Hînek caran jî ji bo ku xwe teselî bikin, mirovan gotiye, "Ku te girt bernede, ku te berda jî bi pey nekeve."

Fersend ne ji bo kesan, ji bo neteweyan in jî. Gelek gelênu ku îro navê wan di dîrokê de tê xwendin lê ew bi xwe tune ne, an jî gelek gelênu ku jîne, lê ya niha navê wan bi xwe jî di dîrokê de nayê xwendin, ji ber bextreşîyeke malkambax e. Yênu ku fersend ji dest berdidin an jî bi dest dixin, li ser navê gel û neteweyan rîber, serok, pêşeng û leheng in.

Xwendevanê birûmet, dibe ku hûn bibêjin bi qedrê Xwedê bikî, te şens û qismet û keys û fersend ji ku derxist. Hûnê bibêjin ilm, diyalektîk û zanist û hwd... her tiştî li gorî prensibên tebiêtê bi rî ve diçe. Dîsa ez ji ya xwe danakevim. Di çarenûsa gel û neteweyan de cihê fersend, keys, şens û bext, girîng e.

Di vê mijarê de gotineke Lenîn heye ku

bûye wecîze: "Duhu zû bû, sibehê jî dibû dereng." Lenîn ev gotin ji bo şoreşa Rûsyayê gotiye. Bi rastî jî wê demê dema şoreşê hatibû an na, nîqaşêke dorfireh dixwaze. Lî tiştî rast ew e ku gotina Lenîn rastiyekê tîne zimên. Wan qurmên li ber lehiyê, tîne zimên. Anglo ji nav ceribandînê jiyanê derketiye.

Li gorî ku ez çapemeniya kurd û tirk dişopînim, Serokê Partiya Karkerê Kurdistanê û Serokê Gelê Kurd Abdullah ÖCALAN, dê di dadgehê de, gotinîne dîrokî bibêje. Helbet cîhan dê van gotinan nîqaş bike û dîrok dê bîryara mafdarbûn an jî mafdarnebûna wî û gotinîne wî bide. Lî li gorî baweriya min, tiştî ku ew dê bibêje, ku duho bigota zû bû, heke van tiştan sibê bibêje îcar dê bi derengî bikeve. Heta îro her ku birêz Öcalan hînek tez an jî ramanê li derveyî qalibê kevneşöpiyê anîne zimên bûye hedef ji statûkoparêz û kevneperestan re. Gelek caran hawariyê wî jî rind di gotinîne wî tênegîhiştine. Lî pişt re demê nîşan daye ku wî fersend baş bi kar anîne. Her çiqas rewşa niha cihê jî be, gelê wî pê bawer e. Ew dê ji bo mirovahîyê, ji bo gelê kurd, gelê tirk û hemû gelên Tirkîyeyê ramanê humanîst û bi xêr pêşkêş bike. 31'ê Gulanê çavén hemû kurdan dê li wî bigerin. Me hemûyan jî bêriya wî kiriye...

MEM KAYA

BÊJING



MRALÎ RA XEBER ESTA

Ocalan Îmralî de kewt menga çeharin

MEMED DREWS

(e-mail:mehmet@welat.com)

Wexto ke min, no niwis kerdê hedire, 19'ê meng bi (gulana 1999). Yanê Se-nê Giştî yê PKK Abdullah Öcalanî Girawê Îmralî de hîrê mengî qedinay li kewtbî menga çeharîn. Tabî mabya menga çeharîn zey manganê ve-nan niya. Dewlet nê hîrê manganê eyd mendan miyan de ci dest ra çîçî me kerd, feqet nêşa wastenanê xo bi-ro ca. Wastenê dewlet winî taynî jî. Nê wastenan ra jewîn "Öcalanî nya ternayina xînt kerdin" didiyin zeyniya PKK ardin" û hîrêyin jî "na-rey kurd û Kurdistanî ya teva néter-yin" bi.

Qandê nê wastenan bi ke, dewlet tkiye ardinê Öcalanî peyra qedinâne serhewadayinê peyinê kurdan ilan kerd. O roj jî zey roşanê dinayin ilan kerd.

Coka jî manaya menga çeharîn ey verînan niya û lazim o ke kes jî, ey verînan mehesibno. Nika, yanê menga çeharîn de Öcalano Girawê Îmralî de, gerîlayê kurdê koyanê Kurdistanî sero û hezarana endam û sem-pazianê partiya Öcalanî yê çehar dînyay de xo ver danê. Hîrê mengî qediyyat.

Öcalan xînt nêbi. Planê dewletê danî nikay pêro kerdî pûç.

Peyniya serhewadayin néame. Her juncika dînyay açaryê cayê serhewadayinê kurdan.

Nameyê kurd û Kurdistanî her kiş dînyay de bi berz.

Öcalan Tirkîye remniyayin peyra kurdê ke, kurdîna xo vîra kerdi, kurdîna xo dî, kurdê ke hara dînyay sero bibî vila, werîstî pay û hem dewleta tirk û hem jî dewletê bînî şas ternay. Înan vatibi qayê Tirkîye ardinê Öcalanî yo peynî ya heme çî biyaro û iyê rehet rehet bikewê û şewanê dergan de hewnî ìnano mehermiyo û mere-mo. Feqet ewro winî biyo ke, hemû planê ci biyê pûç. Bi taybetî jî planê ke, ìnan qandê Öcalanî kerdi bî hedi-re, pêro Öcalanî dî û kerdi pûç. Dewlet o çekerd Girawê Îmralî ke ey xînt bikiro, ey wija açarna Qaleyê xover-dayin.

Dewlet Girawê Îmralî çekerdina vat qayê, Öcalano hîrê çehar rojan miyan de xînt bo û aya ey ra bixelsi-yo. Feqet na wasten, ci qirik de mend û Öcalanî ra nêxelsiyê. Aya nika jî tarsena ke Öcalano plananê ci nê mehkama jî pûç vejo û ar û arbet bi-kiro. Ma şemi nika ra tiya ra vajim no taxmînê dewleto rast vejiyo. Taxmînê ci nê bînî pêro rast nêvejiyay. Feqet noyo rast vejiyo. Öcalano parastinê xoya vatenanê dewletê hetanî nika pêrin pûç vejo. Heta mayê winî taxmîn kemi ke, badê parastina Öcalanî xeylê tirkê ke ewro her fekê xo aker-din de ci rê xebêrî danê iyê haq bidê Öcalanî. Haq medê jî iyê zey ewroy her fekê xo akerdin de Öcalanî rê xe-berî medê.

Çike Öcalano hemû vatenanê dewlet pûç bikiro û kiştoxanê hîris hezaran bîmûsno şarê tirk. Öcalano coka parastina xo zey manîfestoyê jû-wîna demokratîk nîşan dano. Abûka-

tanê Serokê PKK Öcalanî ra Mahmut Şakarî 18'ê menga gulana 1999 de da zanayin ke Öcalanî parastinê xo hew-na nêqedinayo. Feqet hetanî 17'ê menga gulana 98 rîpel nûsto. Şakarî vat ke, iyê taxmîn kenê ke, Öcalano parastin hetanî 24'ê menga gulana 1999 biqedîno. Eke Öcalan hetanî 24'ê meng parastin biqedîno iyê xo jî bewnê parastin (vatena Öcalanî manî-festoyê jûwîna demokratîk). Abûkat Şakarî da müsnayin ke, Öcalano parastina xo goreyê idanameyê dozge-ranê tirk hedire nêkeno. Heta Öcalanî gerek nêdiyo ke, idanameyê dozgeran jî biwano.

Ancî Şakarî vat ke; Öcalano qandê parastin daktifloya nûsten daktifloya was-to, ìnan jî qandê na wasten ca ardin muracat kerdo DGM ya Enqere. Eke daktifloya nêdiyo Öcalanî jî, parastinê ci bido abûkatan û ê tevera daktifloya binûsê û winî berê bidê Öcalanî.

Ancî goreya vatena abûkatê Öcalan Mahmut Şakarî, rojnameyê ke dewleta dana Öcalanî, xeberanê aktû-elan û niwisê ke ey ser nûsyayê birne-na bado dana ey. Yanê rojnameyo rojnameyin ra vejiyeno û beno rojnameyê magazin. Coka jî Öcalano ge-rek nêvîneno biwano jî. Jew çim çar-neno û bado çekeno jû kiş. Öcalano wextê xo qezencanê peyniya mehkama vêşikerdina ravérneno. Öcalano bawer keno ke ey nika ra mehkama qezenc kerda. Çike goreyê Öcalanî biryarê (qerarê) mehkama mûhîm ni-yo, biryarê şaran muhîm o. Coka jî Öcalano gerek nêvîneno idanameyê dozgeran biwano.

Zêdî kurdan



DR. HUSEYNÊ XELÎQÎ

B aşûri rojhîlatî Kurdistan û em beşe lêk da birawe, pire le éşîrekewnarekanî em xake dabeş kirawe ke her kame be şeweyek dabûnêrît û akar û kultur kurdevarî xoyan parastuwe û tenanet beşekiyan hêsta le ser ayînî konî kurdan mawetewe.

Eger le ber kêşeyî mêtû propagandî neyaranî kurd û Kurdistan, beşî "Loristan" lew nawçê ciya bikeynewa carê xoman, be beşî "Îlam û Kırmaşanewê" xerîk bikeyn, deşê le çend bend û çend beş da be hewlkewî coxrafayî serçaweyî dahat, bazîrganî şaristanî, dabûnêrît û akar û reftarî xelkî em nawçane, amaje bikeyn.


Bem cûre xwêner debê çaweriwan bê, le çend witarî kurt da be puxtî, koyî ew babetane wexunê, we le beşek le wilate belalêdrawekey, agadar bê. Diyar e, eger mewda hebe, diwatiw be nawçeanî dîkey rojhîlatî Kurdistan ke êsta le jér çîngî Êranî axundî da ye, amaje dikeyn.

Îlam û şar û şaroçkanî dewrûberî serb ew nawçê wek "Dêhloran", "Heywan", "Salhabat" wek bajaroke ne, "Mîhran", "Gowawir" "Dêre", "Çile", "Wêjenan" û "Heyderiye" wek şaredê ser be Îlam in. "Gîlan yan Gîlanî Rojava" ke le 1908'an de bote şaristan, de nêwan "Sertêl" û "Qesrîşêrin", "Islam-abad" û nawçey îlam da hilkewtuwe. Nawçeyekî kêstanî ye. Rûbarî "Guwawersû" gîranî rojava, lem çawcewe têper debin. Beşike le xakekey lêre wa re. Zorbeyî darekanî beron in. Beşek darî mîwêyî cengelîş têda ye. Awhawayî germ e. Nawî em nawçê le pêş da "Emle" buwe. Le dewreyî Riza Şah da be hoyî cengelîbûnî û merezekîlanî birinc legel gîlanî bakuî Êran hawseng kirawe û ew nawî Gîlaniyan le ser danawe. Be hoyî şerî Êran û Iraq zorbeyî şarî Gîlan çolkiraw û be bombebaran tûşî ziyanî zor hat. Giş danıştiwanî em şare, kurd şîî û êzîdî yîn. Kiştûkal û ajeldarî le wê da baş e we danewleyî zorî têda berhem dê. Xêlî "Kelhor" hawînan bo lewirandinî ajal lem nawçê kelk werdigerin. Karî destiyan ziyatir Gilêm û Reşmal e. Pileyî xwendewarî û şurî komeleyatî zor berz niye. Bîrî eşîreyî be ser zeynî xelkeke da zal e. Kêwî "Bazîdirê" ke qutkekey berz e.

"Sigan", "Bedra", "Kufrawir", "Neftşa" û Somar wek şaroçka û gundekanî ser bew nawende gewre û biçükane ke tenya bo alûwêrî berhemekanî nawçê pêk hatuwin, le nawçeyekî berîn da helkewtu in. Ke beşî zorî şarekanî kewtutewe ser sînorî destkirdî başûrî Kurdistan. Le ber sersînorbûn û kurd û koçer-bûniyan, direng rengo boye şaristaniyetî dewreyî ser-mayedariyan be xo wergirtiwe. Wek wutim, zorbeyî zorî xelkekey şê'e rûxanî rejîmî şah, hêsta koçer bûn ziyatir jiyan. be ajeldarî têper dekird. Her bo wê ew malbende, dabûnêrît kurdevarî serdemî koçerî parastibû. Cilkî kurdi azaftin be zimanî kurdi zar-awayî "Goran" birewî hebû û êtaş heyetî. Xelkî nawçeyî "Sincawî" le bergerme sêrbûnî nawçeyî îlam, zistan be ajelkaniyanewe deçine ew nawçê. Du eşîrî gewre lem nawçê da be nawekanî "Siyesiye" we "Melekşayî" jiyan têper dekeyn.

Bersiva nameya girtiyên jin a Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan

Ez àixwazim we bi awayê herî pîroz bibînim



✓ "Berî her tişti ez dixwazim qîz û jinên mîna we, wekî mirovîn pîroz û hêja bibînim. Hûn hemû jî wisa ne. Bi hêjayî û qîmeta xwe zanibin. Qet nekevin têkiliyê erzan û bênírx; pejinkar bin û doza rastiyê bikin."

Hevalen hêja Suna Parlak, Melahat Akay, Leyla Akbaş;

Nameya ku we şandibû, gîhîst ber destê min. Hevokên li ser rêxistinbûnê hatibûn reşkirin. Gava name bê nivîsîn, ku ji sînorêñ hevaltiya xwezayî derbas nebe û pir ne îdeolojik be, ez bawer im wê bigihêje ber destê min.

Ji ber ku ez di şîneke mezin de me, ez tengesar dibim. Lê ez qet dilê we nahêlim. Hem ji ber ku iro şeşemîn salvegera mirina diya min Uveyş e, ji bo lêxwedîderketinê, divê ez serê xwe pê biêşînim.

Berî her tişti ez dixwazim qîz û jinên mîna we, wekî mirovîn pîroz û hêja bibînim. Hûn hemû jî wisa ne. Bi hêjayî û qîmeta xwe zanibin. Qet nekevin têkiliyê erzan û bêñirx; têkiliyê bêhêz û bêmane saz nekin. Hemû têkiliyê xwe li ser bingehêke ji êş û janan safbûyi, mezin û watedar, a ku hêjayî hezkirinê ye, deynin. Lê teqez bila dadperwerî



felsefeya bingehîn a jiyana we be. Ne dogmatîk bin û tu car ne bêrêgez (prensîb) bin jî. Her dem pejinkar bin û doza rastiyê bikin.

Nîha ku fersenda jiyanê bê dayîn, ez dê bi her awayî doza aştiyê bikim. Min gavine biçûk avetiñ. Şerê aştiyê, şerê herî mezin û hêja ye; gava ku pêk bê, mirovîn durist derdixe holê. Ji mirovê barbar, mirovê hemdem diafirîne. Ez vê yekê gelekî dixwazim. Lê felekê, bi awayekî herî kambax û bêyom û reş tevna xwe rîst. Dîsa jî ez dê zorê bidimê. Ev qet nayê wateya înkarkirina raboriyê; berevajî wê, dê encama wê ya herî mezin, a herî xwezayî be.

Divê hûn teqez vê yekê rast fêm bikin. Çimkî hûn gelekî bext vekirî ne, lewre qedrê vê yekê baş bizanin. Hûn bawer bikin, li darê dinyayê niha tişte ku ez herî zêde dixwazim, zana û hisyarkirina gelê me ye. Her wiha we behsa gotinêñ min ên di balafirê de kiriye. Ew gotina "Ez dê ji bo aştiyê bijîm" ne

gotineke ji rêzê bû. Her çend kût (felçli) be jî, mizgîniya vejînekê bû.

Divê li ser vê bingehê, aştiya bi dewletê re tu caran xelet neyê fêmkirin; ku bi ser bikeve, gelekî hêja ye, gelekî binirx e. Maneya wê ya di serê min de, ev e û divê qet neyê berevajîkirin. Ez diceribînim. Hinekî hêviya min heye. Bêguman ev bi xwe re biratî û yekbûyîna azad tîne; jixwe ev di heman katê de berdêla êş û janêñ mezin û kedê ye. Hemû şer û serhildanêñ ku ne ji bo aştiyê, biratiyê, bihevretiya azad in, kor û ker in. Ev neheqî ye. Êş û azarê didin, rûxîner û alozkar in. Ji ber vê hindê heya rewşa min diyar bibe, divê hûn zorê bidin xwe û bi pejinkariyeke mezin doza aştiya stratejîk bikin.

Min ji bo we hemûyan hezkirineke gelekî mezin amade kir û min hewl da ku pêşkêşî we bikim. Li ser vê baş rawestin û teqez bibin serî.

Edî bila gotinêñ we nêzî zimanê stran û helbestê bin. Pêvajoya

dawîn bi şêweyekî stranî, helbestî wêjeyî bihonin.

Gava ku we dîrok xwend, Gilgamêş baş fêm bikin. Di vir de, aşti û biratiya di pirtûka pîroz a sê Pêxemberan de baş fêm bikin. Li ser vê bingehê siyaset û şoreşê bi awayekî ku hûn xeletiyan nekin, sersariyê nekin, êşan baş fêm bikin, neheqiyê nekin û rê ji neheqiyê re venekin, têxin nava dil û hinava xwe.

Hûn hemû, ku hezkirina min aji bo jiyanê başebaş fêm bikin û ji bo hemû mirovahîyê, bo Tirkîyeyê û gelê me têxin jiyanê, her wiha pêşkêşî her kesî bikin, ev ji bo we dibe destkeftina herî mezin.

Ez dawiyê li nameya xwe tînim. Name ji bo we hemûyan e. Ez we hemûyan hembêz dikim û silavêñ xwe li we dikim.